# hawar

Rojnameya Rojane
7 Gulan 2009
Pêncşem
Sal: 1
Hejmar: 2
Buha: 50 Kr


## 'Şanoya kurdî dibistaneke mezin e'



Şanoger Metîn Ewr ku weke kesekî paşperdeya şanoyê kurdî tê zanîn heta niha 11 tekstên şanoyê nivîsîne. Ewr, diyar kir ku divê mirov weke dibistaneke hunerê li şanoyê binêre û ji bo perwerdekirina civakê gelekî girîng e... Rûpel - 6

# Ev in 'Kurdên Dewletê'

Aşkera bû ku bûyera gundê Zankirta navçeya Şemrexa Mêrdînê bi destên hêzên tarî pêk hatiye. Şahidan di îfadeyên xwe de got ku armanca kesên bi maske ew bû ku vê bûyerê bixin stûyê PKK'ê

### RASTÎ BI ÎFADEYAN DERKET HOLÊ

Derket holê ku cerdevanên êrîşkar ku 44 kes qetil kirin, xwest bûyerê bixin stûyê PKK'ê. Vê yekê jî gumanên ku tiliya hêzên dewletê yên tarî di vê bûyerê de hene, zêde kirin. Êrîşkaran di îfadeyên xwe de gotin ku armanca wan a ji nehiştina şahidan ew bû ku bi rehetî bûyerê bikin malê PKK'ê.

### ÇIMA MASKE XISTIN SERÊ XWE

Cerdevanên êrîşkar bi maske bûn. Ji ber ku di bûyerê de kujeran maskê bi kar anîbû gelek guman û spekûlasyon hatin kirin. Wekî tê zanîn ku dema JÎTEM, kontra û cerdevan bûyerên bi vî rengî pêk tînin û dixwazin bikin stûyê PKK'ê, maskê bi kar tînin.

### DI 2 SALAN DE 61 KES QETIL KIRIN

Li Kurdistanê sîstema cerdevaniyê di 26'ê adara 1985'an de hate damezirandin. Di nava 24 salan de cerdevanan gelek kes qetil kirin, gelek jin rastî tecawiza cerdevanan hatin, bazirganiya narkotîkê kirin û bi ser gelek gundan de girtin û şewitandin... *RÛPEL -3*



## Rûyê rast ê 'Kurdên Dewletê'

### Çekên dewletê bi kar anîn

■ Cerdevanan qetlîam bi çekên cerdevaniyê yên ku dewletê dane wan pêk anî. Êrîşkar Abdulkadîr Çelebî cerdevan e. Heman kesan di demên borî de li dijî PKK'ê li cem dewletê cih girtiye



### Çima yekser gotin tore ye?

■ Balkêş e ku herî zêde rayedarên hikûmetê hewl da ku bûyerê wekî meseleyeke kevneşopî nîşan bidin û xwestin rê li ber vekolîn û analîzkirina cerdevanî û aliyên ku dewletê eleqedar dikin, bigirin.

### Aliyên nezelal gelek in

■ Jixwe her kes dizane ku ev qetlîam ji aliyê peywirdarên dewletê (cerdevan) ve hatiye kirin. Bi çekên dewletê hatiye kirin û li ber pozê qereqolê çêbûye. Lê her kes dixwaze piştperdeya vê bûyera hovane bizane.

## 'Cerdevaniyê vekolînin'

Koma DTP'ê ya Parlamentoyê xwest ku lêkolîn li ser pergala cerdevaniyê bê kirin. DTP'ê xwest ji bo lêkolînkirina pergala cerdevaniyê ya ji sala 1985'an heta niha û sûcên hatine kirin xwest ku Komîsyona Lêkolînê ya Meclisê bê avakirin. DTP'ê xwest ku di vê çarçoveyê de pergala cerdevahiyê jî ji holê bê rakirin. Parlamenterê DTP'ê yê Şirnexê Hasîp Kaplan bi armanca lêkolînkirin, derxistina sûcê ji sala 1985'an kirine û jiholêrakirina pergala cerdevahiyê pêşniyarnameyek amade kir û parlamenterên DTP'ê jî îmze kirin.

## Dosyayên Akat û Kurtulan şandin Meclisa Tirk

**DOSYAYÊN** ku ji bo destêdana li ser du parlamenterên DTP'ê rabin hatibûn amadekirin, çûn Meclîsê. Dosyaya ku ji bo destêdana li ser Cîgira Seroka Koma DTP'ê û Parlamentera DTP'ê Fatma Kurtulan û Parlamentera Êlihê Ayla Akat Ata rabe hatibû amadekirin, sewqî Komîsyona Têkel a Edalet-Makeqanûnê ya TBMM'ê hatin kirin. Ev dosya wekî gef û tehdîd li dijî parlamenteran tên bikaranîn.

## DTP: Cezayê didin şaredaran dewama konsepta fermî ye

**DTP'Ê** daxuyaniyeke nivîskî da û diyar kir ku piştî hilbijartina herêmî ya 29'ê adarê bi daxuyaniyên Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan û Cîgirê wî Cemîl Çiçek re li hemberî DTP'ê konsepteke êrîşê ketiye dewrê. Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku di encama vê konseptê de endam û rêveberên wan hatine girtin û hate diyarkirin ku di gihaneka duyemîn a konseptê de jî cezayên keyfî û ne hiqûqî li şaredarên wan hatine birîn.

## Qetlîam: Kurdên Dewletê

Kurd dîsa bi qetlîameke hovane ya hêzên bi destê dewletê hatine afirandin re rû bi rû ma. Du armancên esasî yên vê êrîşê hebûn… Lê di her du armancên xwe de jî hêzên xêrnexwaz bi ser neketin û rastiya 'kurdên dewletê' aşkera bû....

Tayîp TEMEL - Rûpel 2

## Ev cinawer kê afirandin?



Bûyer hene; hiş û aqilî mat û metel dihêlin. Tenê mirov bi devê beş lê temaşe dike. Hemû riyên aqilî, tezên ilmî pêpes dibin û însanetî bi...

Omer DILSOZ- Rûpel 6

## Ji ÎHD û MAZLUMDER'ê nerazîbûn

**SEROKÊ** Giştî yê MAZLUMDER'ê Omer Faruk Gergelîoglu diyar kir ku komkujiya li gundê Kertê yê navçeya Şemrexê bûyereke biçûk a toreyê nîn e û wiha got: "Ev bûyer têkbirina pêvajoya agirbestê û provokasyonê tîne bîra mirov. Lazim e berî her tiştî pergala cerdevaniyê ji holê bê rakirin." Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Amedê Muharrem Erbey jî diyar kir ku sedema komkujiyê pergala cerdevahiyê ye û xwest ku ev polîtîka bi dawî bibe... *R.3*

# Denîz Gezmîş û hevalên wî hatin bibîranîn




Sazkarên Artêşa Gel a Rizgariya Tirkiyeyê (THKO) Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan û Huseyîn Înan di 37'emîn salvegera bidarvekirina xwe de li Stenbolê bi sê çalakiyên cuda hatin bibîranîn. Hewlkariya 78'iyan, ÎHD, DTP, Bizava Azad û Demokratîk a Elewiyan, ODP û SDP jî tê de hin partiyên siyasî û saziyên sivîl li ber Lîseya Galatasarayê 37'emîn salvegera bidarvekirina Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan û Huseyîn Înan bi çalakiyeke hevpar bi bîr anî. Weqfa Yekitiya 68'iyan jî li ber Mizgefta Dolmabahçeyê çalakiyek bo bîranîna Denîzan pêk anî. Çalakiya sêyemîn jî ji aliyê Platforma Serbixwe Çîna Şoreşger û Ciwanên Ekînê ve hate lidarxistin.

# ‘Armanca sûîqesta li Şamê tasfiyekirin bû’

**Tirkiyeyê bi destê hêzên îstixbaratî di 6’ê gulana 1996’yan de li Şamê li dijî Ocalan sûîqestek pêk anî. Şahidên wê demê gotin ku ev êrîş bi piştgiriya hêzên navneteweyî ji bo têkbirinê hatibû lidarxistin**

Di ser sûîqesta li hemberî Lîderê PKK’ê Abdullah Ocalan re 13 sal derbas bûn. Di 6’ê gulana 1996’an de bi biryara hikûmeta tirk û Artêşa Tirk li hemberî Ocalan li Şamê sûîqestek hate lidarxistin û bêyî ku windahiyek pêk bê teqîn pêk hatibû.

ANF’ê nûçeyek li ser sûîqesta li hemberî Ocalan pêk hatî weşand. Kesên ku wê dema şahidiya bûyerê kirine, bûyerê wiha vedibêjin: “Dewleta tirk bi alîkariya NATO, Israîl û hin hêzên navneteweyî di 6'ê gulana 1996'an de li paytexta Sûriye Şamê li dijî Ocalan sûîqestek pêk anî. Bombeya ku li nêzî Dibistana Navendî ya PKK'ê hatibû bicihkirin, di 6'ê gulanê de, bi dengekî mezin teqiya. Lîderê PKK’ê Abdullah Ocalan ji sûîqesta bombeyî ya dewleta tirk bi awayekî xilas bû.

### Di roja bidarvekirinê de sûîqest

Dewleta tirk bi vê sûîqesta di salvegera bidarvekirina pêşengên Tevgera Şoreşgerên Tirkiyeyê Denîz Gezmiş û hevalên wî pêk anî de, xwest ku tevî kurdan, dawî li lêgerîna azadiyê ya gelên Tirkiyeyê bîne. Lê belê tedbîrên Lîderê PKK’ê Abdullah Ocalan, nehiştin dewleta tirk bigihêje armanca xwe û ji teqînê jî tu zirar li Ocalan û hevalên wî nebû.”

### Tiliya hêzên navneteweyî

Her wiha çavkaniyên li wir û şahidên wê demê diyar dikin ku rêveberiya tirk, ev sûîqest bi alîkariya hêzên navneteweyî pêk anîbû û armanca wê jî, kuştina Ocalan bû. Şahidên bûyerê vê yekê wiha vedibêjin: “Serokwezîra wê demê Tansu Çîller ji bo nûçeya kuştina Ocalan ragihîne raya giştî hemû amadekarî kiribûn. Dema teqînê Ocalan bi telefonê diaxivî û ji ber teqînê axaftina xwe birî. Ji ber vê jî, rayedarên tirk bawer kirin ku Ocalan miriye. Lê belê piştî ku axaftina bi telefonê re dîsa dest pê kir, xeyalên wan têk çûn.”

### Plana wan berfireh bû

Şahidên bûyerê destnîşan kirin ku dema dewleta Tirkiyeyê berê xwe da Şamê hem li Bakur hem jî li Başûr êrîşên xwe yên li hemberî hêzên parastinê zêdetir kirin û plana sûîqestê wiha şîrove kirin: “Lê plana wan a esasî di demsala payîzê de bû. Heke sûîqest serkeftî bûya, dê di payîzê de bi operasyoneke mezin bixwestina hêzên li çiyan biçewisînin. Ji ber ku ji sûîqesta Şamê encam negirtin operasyona ku payîzê bikin jî nekirin. Lewra dîtin ku lingê planê yê yekemîn pêk nehat, dê lingê wê yê duyemîn jî encamê negire.

### Êrîş ji bo demsala biharê ma

Plana duyemîn dan rawestandin û ji nû ve nirxandina rewşê kirin. Operasyona ku bikin hiştin ji bihara 97’an re. Di bihara 97’an de xwestin ku li başûrê Kurdistanê bi operasyoneke berfireh darbeyekê li gerîla bixin û têkiliya Ocalan û welat ji hev qut bikin. Di heman demê de zextên li ser Sûriyeyê jî zêde kirin û xwestin Ocalan bêbandor bihêlin. Lê, dema ji vê jî encamek negirtin piştre hin plansaziyên din xistin dewreyê.” **BRUKSEL / ANF**



# Pêwîstiya hilpekîneke nû ya 68’an

**HESEN HUSEYÎN DENÎZ**

Duh salvegera darvekirina Denîz Gezmîş û hevalên wî bû. 37 sal ji qetilkirina Denîz Gezmiş û hevalên wî derbas bûn. Di hundirê van 37 salan de ji pêşketina têkoşîna azadî û demokrasiya gelên Anatolya zêdetir, ciwanên kurd wê kevneşopiyê didomînin.

Sazûmana tirk bi awayekî hovane di roja 6’ê gulana 1972’an de li paytexta Tirkiye Enqereyê rêberên şoreşê darve kirin. Deniz Gezmiş, Huseyîn Înan, Yusuf Aslan dixwestin ku li ser xaka Anatolya jiyaneke azad, wekhev û aştiyane bê sazkirin. Bi vê armancê li hemberî sazûmana dagirker û sermayedar serî hildan. Xwestin gel hişyar û rêxistin bikin ku bikaribin ji bin zilma hovane ya Kemalîst derxînin û bigihînin sazûmaneke gelêrî ya ji gelên li ser xaka Anatolya dijîn re rêzdar be.

Di navbera qirkirina van şoreşgerên hêja û roja me de 37 sal derbas bûn. Di hundirê van 37 salan de ji pêşketina têkoşîna azadî û demokrasiya gelên Anatolya zêdetir, gelê kurd bi hêzgirtina ji Denîz û hevalên wî, dest bi tevgera azadiyê kir û her roj bi serkeftineke mezintir doza wan heta roja me domand û hêviya azadiyê di nava gelan de çand.

Lê mixabin li Tirkiyeyê ne di warê rêxistin û partiyên sosyalîst, pêşverû û şoreşgerî de û ne jî di warê partiyên demokrat ên di nava sazûmanê de cih digirin de, tu pêşketineke berbiçav a ku li mîratê Denîzan xwedî derkeve nehat dîtin. Her roja çû, gel zêdetir ket bin bandora sazûmana zilmdar û partiyên wek AKP’ê xwînmij û munafiq û kesên wek Denîz Baykal nijadperest û faşîst derxistin holê. Gelê Tirkiyeyê dan destê sazûmanê û gel ji hemû awayê xwerêxistinkirinê dûr hiştin. Her çiqasî di warê yeko yeko kesan de dem bi dem li hemberî sazûmanê serîhildanên biçûk pêk hatibin jî, dewletê di van salan de xwe di warê leşkerî û çetetî de xurt kiriye, di cih de bi girtin û qirkirinê bersivê dide wan. Ji bo vê wekî zîldana ji bin axê ku nû serê xwe derxîne û tu biqermiçînî, wiha li serê şoreşgerên Tirkiyeyê tê.

Tê bîra min, beriya cûntaya 12’ê Îlonê bi deh hezaran kes dimeşiyan qada Taksîmê. Piştre di sala 1977’an de roja 1’ê Gulanê 34 kes bi destê hêzên dewletê hatin qirkirin.

Girtin, îşkence, qirkirin, înkar, bêkar û birçîhiştina gel a bi destê dewletê hatiye qadeke wiha ku êdî di yaxa gel nemaye. Lê li Tirkiyeyê kes û hêzên pêşengî û rêberiya gel bikin –ên durist- lawaz, ên rantxur jî di bin perdeya sosyalîzmê de ji faşîstan xerabtir dijîtiya şoreşê dikin.

Bi vê sedemê pêwîstiya gelên Anatolya bi bişkivînek û hilpekîneke nû heye. Zîldana 68’an divê ji nû ve serî ji bin xakê derxîne û bi lez xwe bigihîne tîrêjên rojê ku sazûmana zordar nikaribe serî biqurmiçîne. Dema yeko yeko zîldan çêdibe, bi lez diqurmiçîne, lê ku wekî zîldana Denîzan xwe li giştiya welêt vegire, wê demê dibe ku çendek ji ber devê cendereya hovîtiya Kemalîzmê bifilitin û tevgereke nû ya şoreşgerî derxînin holê û diyarî gelê xwe bikin.

Tê dîtin ku Tevgera Azadiya Gelê Kurd pêşketineke mezin dijî û dewleta desthilat bi ber hilweşînê ve dibe. Lê di vê rêveçûnê de her tenê tê hiştin. Gelê tirk mixabin ne bi gelê kurd re, bi dagirkeriya xwe re tevdigere. Sedema wê jî lawazbûn û tunebûna rêberiyek berdewamiya giyana tevgera Denîzan e. Ger bi hilpekîna tevgereke wiha destekdayîna Tevgera Azadiya Kurdistanê çêbibe, ev sazûmana Kemalîst a hovane û xwînmij wê bikaribe were hilweşandin û gelên Anatolya û Mezopotamya bikaribin bigihêjin tîrêjên azadî, demokrasî û aştiyê. Wê demê dê hêvî û armancên Denîz û hevalên wî jî bikaribin bi cih bên û miradê wan were biserxistin.

Çi dibe bila bibe di van deh salên pêşiya me de, divê gelê Tirkiyeyê xwe komî ser hev bike, rêberên xwe bibişkivîne, destekê bide Têkoşîna Gelê Kurd û xwe ji vê sazûmana hov û xwînmij rizgar bike. Wekî din tu rê li ber gelê Tirkiyeyê nîn e û bi tu rêkên din nikare li mîratê Denîzan xwedî derkeve. Denîzan riyeke rûmet a azadî, demokrasî û aştiyê diyarî gelê xwe kirin. Di vê oxirê de canê xwe gorî kirin, gel pêwîst e li vî mîratî xwedî derkeve ku bikaribe rûmeta xwe ji nav piyan rahêle.

Di 38’emîn salvegera şehadeta Denîz û hevalên wî Huseyîn û Yûsif de jiyaneke azad, demokratîk û wekhev ji bo gelên Anatolya û Rojhilata Navîn hêvî dikim û wana bi rêzdarî bi bîr tînim.

## Deng

# Qetlîam: Rastiya ‘kurdên dewletê’

tayiptemel@walla.com
TAYÎP TEMEL

Kurd dîsa bi qetlîameke hovane ya hêzên bi destê dewletê hatine afirandin re rû bi rû man. Her çiqas li ser bûyerê gelek tişt hatibin nivîsandin jî dîsa gelek hêzên ku piştperdeya bûyerê ronî dikin di tarîtiyê de mane. Qetlîameke bi vî rengî ne mimkûn e ku wekî bûyereke dînîtiyê bê nirxandin bê binavkirin.

Hele qet nabe ku bi tenê aliyê wê yê tore (kevneşopî û edet) derkeve pêş. Nirxandineke bi vî rengî tê wateya manîpulekirin û peçînîna hin aliyên girîng ên bûyerê. Balkêş e ku herî zêde rayedarên hikûmetê hewl da ku bûyerê bi vî rengî nîşan bidin û xwestin rê li ber vekolîn û analîzkirina aliyên ku dewletê eleqedar dikin, bigirin. Jixwe her kes dizane ku ev qetlîam ji aliyê peywirdarên dewletê (cerdevan) ve hatiye kirin. Bi çekên dewletê hatiye kirin û li ber pozê qereqolê çêbûye.

Îfadeyên êrîşkaran dayî mirov matmayî dihêle. Ew bi xwe dibêjin ku wan bi zanebûn xwestiye kesê zindî nehêlin da ku bikarin bûyerê bixin stûyê PKK’ê. Em hemû baş dizanin ku her  wisa hatiye kirin.

Dewletê di pêvajoyên krîtîk de berevajî ku pêşiyê li qetlîamên bi vî rengî bigire, wan teşwîq dike û ji bo ku pêvajoyek sabote bibe pêşî li êrîşkaran tê vekirin. Gelek mînakên bi vî rengî yên di dîroka nêzîk a Tirkiyeyê de hene. Hêzên (ne)nepenî gelek caran bi xwe êrîşên bi vî rengî organîze kirine û avêtine stûyê PKK’ê. Basiya, Hemka, Çewlik û gelek deverên din şahidî ji êrîşên bi vî rengî re kirine.

Dema mirov li hin aliyên bûyera ku li Şemrexê li gundê Zankirtkê pêk hatî dinêre gumanên mirov zêde dibin ku ev bûyer jî bi teşwîqa hêzên dewletê pêk hatiye.

### Ji ber çi?

Ji ber ku pêvajoyên bi vî rengî ji bo bûyerên bi vî awayî guncan in. Mimkûn e ku beşeke hêzên ewlekariyê hesabên bi awayî kiribin. Ma ne mimkûn e ku Ergenekonên nû ketibin dewreyê û vê pêvajoyê sabote bikin. Xuya ye ku hin hêzan dîsa xwest bi destê paşverûtiya ku bi destê dewletê hatiye pêşxistin du armancên xwe yên esasî bi cih bînin.

### Armanca yekemîn;

Ew e ku mesaja; ‘kurd paşverû û cahil in, toreyên wan belaya serê mirovahiyê ne û ew nikarin xwe îdare bikin’ bidin hemû cîhanê.  Piştî kurdan di warê rêveberiya xwebixwe de di hilbiartinên de serkeftineke ev qas mezin bi dest xist, dayîna peyameke bi vî rengî bêguman êrîşeke mezin e li dijî asta ku têkoşîn û şoreşa zihniyetê ya kurdan gihiştiyê. Yanî xwestin ku şoreşa zihnî ya kurdan bi vê mînaka ku ‘kurdên dewletê’ aktoriya wê kiriye reş bikin.

### Armanca duyemîn û ya esasî;

Xwestin êrîşê bavêjin stûyê hêzên girêdayî PKK’ê. Bi vê yekê dixwestin ku di van rojên ku nîqaş û gavên pozîtîf ji bo çareseriyê ji aliyê Tevgera Azadiya Kurd ve hatine avêtin, rewşê berevajî bikin. Ango dîsa zemîna propagandaya ‘PKK’ê sivîl qetil kirin, kanê we agirbest îlan kiribû!’ li nav raya giştî belav bikin.

Lê hêzên xêrnexwaz di her du armancên xwe de jî bi ser neketin. Heta mirov dikare bêje ku bi vê bûyera mirov xemgîn dike rûyê ‘kurdên dewletê’ dîsa deşîfre bû û girîngiya tasfiyekirina cerdevanî û cehşatiya ku li nav kurdan hatiye belavkirin dîsa derket holê.

Lê xweziya ku ew mirovên bêguneh û belengaz nehatibûna qetilkirin û hewcedarî bi tahlîleke wisa nebûya.

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
*Adres:*
Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
*TEL:* 0 (412) 229 00 30
*Fax:* 0 (412) 229 00 39

Baskı *(ÇAP):*
*Stenbol:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
*Tel:* 0 (212) 580 63 80
*Edene:* Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. *No:* 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

www.arsivakurd.org

# Plana gemar a cerdevanan pûç bû

**Derket holê ku di bûyera gundê Zankirta navçeya Şemrexa Mêrdînê de destên hêzên tarî hene û xwestine bûyerê bikin stûyê PKK'ê da ku wê reş bikin û pêvajoya heyî ya aştiyê sabote bikin**

Derket holê ku cerdevanên êrîşkar ku 44 kes qetil kirin, xwest bûyerê bixin stûyê PKK'ê. Vê yekê jî gumanên ku tiliya hêzên dewletê yên tarî di vê bûyerê de hene, zêde kirin. Êrîşkaran di îfadeyên xwe de gotin ku armanca wan a ji nehiştina şahidan ew bû ku bi rehetî bûyerê bikin malê PKK'ê.

Di vê navberê pirsiyarkirina 12 kesên piraniya wan cerdevan li Fermandariya Cendirmeyan a Şemrexê hat kirin û ji vana 8 kes bi carek û 2 kes rojek li dû vê bi giştî 10 kes hatin girtin. Ji her xalên ku guman jê hene diyar bû ku tiliya hin hêzên tarî di bûyerê de heye. Êrîşkaran xwest ku bûyerê bixin stûyê PKK'ê.

### Xwestin bixin stûyê PKK'ê

Ji îfadeya êrişkarê cerdevan Abdulkadîr Çelebî de diyar bû ku armanca wan ew bû tu kes ji tevkujiyê bi saxî rizgar nebe da ku kes nizanibe bûyer wan kiriye. Çelebî îtîraf kir ku bi vî awayî wan dê bikariya bi hêsanî qetlîamê bixin stûyê PKK'ê û bigihîjin armanca xwe.

### Maske xistin rûyê xwe

Êrîşkaran dema tevkujî kirin bi maske bûn. Ji ber ku di bûyerê de kujeran maske bi kar anîbû gelek guman û spekûlasyon hatin kirin. Wekî tê zanîn ku dema JÎTEM, kontra û cerdevan bûyerên bi vî rengî pêk tînin û dixwazin bikin stûyê PKK'ê, maskê bi kar tînin.



### Çekên dewletê bi kar anîn

Mijareke din a balkêş ew e ku qetlîam bi çekên dewletê pêk hatiye. Êrîşkar Abdulkadîr Çelebî û malbata xwe cerdevan in. Heman kesan di demên borî de li dijî PKK'ê li cem dewletê cih girtine û tê îdiakirin ku tiliya wan di qetilkirina gelek kesan de heye. Di bûyerê de çek û muhîmata ku bi kar hatiye yên dewletê ne.

### Qereqol 4 kîlometre dûr e

Qereqola leşkerî ji gundê Zankirtê yê ku bûyer lê qewimiye 4 kîlometre dûr e. Dema bûyer qewimî herî dereng 10 deqîqeyan de mudaxeleya leşkeran pêkan e. Lê qereqol piştî ku dinya ronî dibe, ango piştî 2 an jî 3 saetan diçe gund. Hin kes û derdor ji nehatina qereqolê guman dikin û ev yek dibe sedema şîroveyên wekî; dibe ku tiliya hin rayedarên dewletê di vê bûyerê de hebe.'

### Vegera gundan û têkiliya tevkujiyê

Hin rayedarên dewletê ku nexwestin navê xwe aşkera bikin diyar dikin ku sedemê vê tevkujiyê vegera gundan e. Dewletê gund vala kirin, ên ku man jî kirin cerdevan, di van şertan de axa gundiyên koçber kirî li ser cerdevanan hate tapûkirin. Di çarçoveya projeya vegera gundan de dema xwediyê erdan vedigerin gundê xwe rastî êrîşa cerdevanan tên. Mînakên wisa li hemû gundên ku cerdevan lê hene çi mezin çi biçûk rûdaye. Lê dewlet ji ber vê xwe di ber çavan re derbas nake û hê jî piştgiriya cerdevanan dike.

### Pêvajoya krîtîk

Pêvajoya heyî pêvajoyeke krîtîk e. PKK'ê heta 1'ê hezîranê biryara bê çalakiyê da. Pêşî li diyalog û aştiyê vekir. Banga aştiyê kir. Hêviyên ji bo vê zêde bûn. Rojnamegerê Mîlliyetê Hasan Cemal bi Serokê KCK'ê Murat Karayilan re hevdîtin kir. Çarçoveya pêvajoyê ya ji bo aştiyê diyar kir. Atmosfereke nerm afirand. Hêzên tarî ji vê atmosferê fikaran dikin. Pirtir dewleta kûr, JÎTEM, Kontra, cerdevan û hwd. Di demên borî de jî bûyerên wisa yên reşkirinê di van pêvajoyên krîtîk te pêk hatin. Bûyera Çewligê ku 33 leşker di sala 1993'yan de hatin kuştin bûyera herî balkêş bû ku bû sedema rawestandina diyaloga navbera dewleta Tirk û PKK'ê ku derket holê destê hêzên tarî di vê de hebûn. **MÊRDÎN**



## Lorîn ji gund bilind dibin

Li gundê Zankirta navçeya Şemrexa Mêrdînê malbata Abdulkadîr Çelebî, çar law û 3 xizmên wan bi çekên cerdevaniyê 6 zarok, 3 jê ducanî 16 jin û bi giştî 44 kes qetil kirin. Ji wan 39 kes ji malbata Hemît û Cemîl Çelebî ne û yên din jî mele û mêvan in. Piştî tevkujiyê jinên gund her roj di saetên serê sibê de li ser goristana gundê Zankirtê li ser gorên xizmên xwe bêyî ku rawestin lorandinê didomînin. Aliyê herî dilsoj û dilşewat zarok in. Ku ji ber vê bûyerê bi kêmanî 70 zarok sêwî man. Heke hin kes li wan xwedî derneyên dê di şexsê wan zarokan de karesateke însanî biqewime.

## ÎHD û MAZLUMDER: Peyayên dewletê ne

Serokê Giştî yê MAZLUMDER'ê Omer Faruk Gergelîoglu û Serokê Şaxa ÎHAD'ê ya Amedê Muharrem Erbey diyar kirin ku komkujiya li gundê Zankirtê yê navçeya Şemrexê bûyerek biçûk a toreyî nîn e û wiha gotin: "Ev bûyer têkbirina pêvajoya agirbestê û provokasyonê tîne bîra mirov. Lazim e pergala cerdevaniyê ji holê bê rakirin."

Gergelîoglu têkildarî êrîşên Israîlê yên li ser gelê Filistînê diyar kir ku Israîl çekên fosforê bi kar tîne û wiha domand: "Me mînakên ji kesên hatine qetilkirin anîne li Zanîngeha Teknîk a Yildizê dane lêkolînkirin. Derket ku Israîl fosforê bi kar tîne. Ji bo vê li Dozgeriya Komarê ya Enqereyê gilî kiriye. Lê Wezareta Dadê destûr neda. Ev ne tenê helwesta Wezîrê Dadê ye; helwesta hikûmeta AKP'ê jî ev e. Ev jî nîşan dide ku helwesta Erdogan a li Davosê samîmî nebû."

Gergerlîoglu komkujiya li Mêrdînê wekî komkujiya pergala cerdevaniyê nirxand û wiha pê de çû: "Dewletê bêhesab û kitab çek xistine destê cerdevanan. Ev çek û muhîmata leşkerî dibe sedema gelek bûyerên wiha. Ev komkujî jî ne bûyereke toreyî ye, komkujiya pergala cerdevaniyê ye. Di vî warî de xebatên me hene. Komkujiyek pêk hatiye. Yên hatine girtin hemû cerdevan in. Divê pergala cerdevaniyê ji holê bê rakirin. " Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Amedê Muharrem Erbey jî têkildarî komkujiya li Mêrdînê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Erbey got ku ji bo tu şahid li paş nemînin komkujî pêk hatiye. Ev bûyer nîşan dide ku tê xwestin zemîna agirbestê ji holê bê rakirin. Hind derdor dixwazin mijarê bi gotina 'toreyê' veşêrin. Bi vê yekê cerdevanên terorê pêk tînin, didin jibîrkirin. Lazim e piştî vê bûyerê di zûtirîn demê de pergala cerdevaniyê ji holê bê rakirin. AMED

## 'Kaleşnîkof narincok û BKC dan'

Komkujiya Zankirta navçeya Şemrexa Mêrdînê ku 44 kes ji aliyê cerdevanan ve hatin qetilkirin hê bi her awayî di rojevê de cih digire. Rayedarên dewletê û rojnameger di komkujiyê de faktora cerdevaniyê nabînin. Di vê navberê de derket holê ku ku Walîtiya Mêrdînê meha borî li gorî daxwaza cerdevanan 30 çekên otomotîk ên BKC, 400 çekên kaleşînkof û 500 heb narincok dane cerdevanan.

Her wiha piştî vê komkujiyê ya herî balkêş ev bû ku rayedarên dewletê der barê pergala cerdevaniyê de tu daxuyanî nedan. Lewre jî wekî ku ev nebes be walîtî û yekîniyên leşkerî ji bo ku hejmara cerdevanan zêde bikin ketin nava hewldanan û çekên otomotîk, bombeyên destan belav dikin. Li ser vê komkujiyê tişta ku herî bala mirovan dikişîne ev e ku tu rayedarekî dewletê dema ku bûyer şermezar dikir, der barê pergala cerdevaniyê de tiştek negot. Tenê DTP xwe amade dike ku mijarê bibe meclîsê. **AMED**

## 10 meh ceza dan nûçegihan Gok

Der heqê 8 kesên nûçegihanê DÎHA'yê Abdurrahman Gok jî di nav de ku bi hinceta tevî bûyerên di dema pîrozbahiyên 1'ê Gulana 2004'an de pêk hatine bûne dihatin darizandin ji bo her yekî 10 meh cezayê girtîgehê hate dayîn. Balkêş e ku tevî di dosyaya dozê de ropara kesê şareza diyar dike ku nûçegihan Abdurrahman Gok "kevir navêtiye polîsan", "sloganên derzagonî navêtiye" û dozger jî biryara beraetê daye jî ceza hate birîn.

Danişîna doza ku bi hinceta di pîrozbahiya 1'ê Gulanê Cejna Karkeran de ya di sala 2004'an de hate pêkanîn de kevir avêtine polîsan û sloganên derzagonî avêtine der heqê 25 kesan de li 8'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Îzmîrê hatibû vekirin hate dîtin. Hin bersûc û parêzerên wan tevî danişînê bûn. Di danişînê de parastina dawî ya bersûcan û parêzerên wan hate pirsîn û hate xwestin ku dozger mutaleya xwe ya der barê esasê de bide. Piştî ku parastina bersûcan, parêzerên wan û mutaleya dozger hate guhdarîkirin, heyeta dadgehê navbereke kurt da danişînê û piştre biryara xwe diyar kir.



### Ligel dozger ceza lê hat birîn

Heyeta dadgehê, ji bo 8 kesên nûçegihan Abdurrahman Gok jî di nav de 12 meh cezayê girtîgehê xwest, ceza ji rêjeya 1/6 hate daxistin û biryar 10 meh cezayê girtîgehê da. Di rapora kesê şareza de ya di dosyaya dozê de tê diyarkirin ku nûçegihanê DÎHA'yê Gok kevir navêtiye polîsan û sloganên derzagonî neavêtine. Her wiha dozgeriyê jî der barê Gok de biryara beraetê dabû. Tevî vê yekê jî heyeta dadgehê li nûçegihan Gok ceza birî.

Abdurrahman Gok, hîn jî di Girtîgeha Tîpa E ya Sêrtê de tê girtin. Gok ku dema di 23'yê adarê de li Sêrtê pîrozbahiyên Newrozê dişopand hate binçavkirin, ji aliyê dadgehê ve hatibû girtin û ew rêkiribûn girtîgeha Tîpa E ya Sêrtê. Hêjayî gotinê ye ku piştî hilbijartina 29'ê adarê zextên li ser çapemeniya kurd zêde bûn. **ÎZMÎR / DÎHA**

## TMMOB: Berpirs cerdevanî ye

Serokê Lijneya Koordînasyona Bajêr a TMMOB'a Wanê Şevket Akdemîr, der barê komkujiya li Mêrdînê de, li avahiya TMMOB'a Wanê civîna çapemeniyê li dar xist. Akdemîr, diyar kir ku bûyera li Mêrdînê pêk hatî ne tenê bûyereke toreyî û an jî navmalbatî ye. Akdemîr, bal kişand ku bi çekên ji hêla dewletê ve hatine belavkirin ev bûyer pêk hatiye. Akdemîr, destnîşan kir ku pergala cerdevaniyê bûye wekî birînekê her tim xwîn jê diherike. Ji ber vê yekê em wek Koordînasyona Bajêr a TMMOB'a Wanê, dixwazin ev pergala cerdevaniyê di zûtirîn demê de bê jinavbirin. Akdemîr, anî ziman ku ji ber vê bûyerê wan jî êş kişandine û derbirî ku heta pergala cerdevaniyê hebe wê bûyerên bi vî rengî jî bidomin. **WAN**

## Ji govendê re 10 sal ceza birîn

**ÊLIH**

Der heqê 3 kesên bi hinceta li Êlihê li ber strana "Oremar" govend girtine de ji aliyê 4'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê ve li gorî xala 7/2 ya Zagona Têkoşîna li Hemberî Terorê ji bo her yekî 10 meh cezayê girtîgehê hate dayîn. Doza ku kesên di 19'ê tîrmeha 2008'an de ji bo tevî kongreya DTP'ê bibin li ber Bulvara Koçerler a Êlihê hatin cem hev der heqê Seyfettîn Kurt, Sumeyye Gok û Bulent Kurt de bi hinceta li ber strana "Oremar" govend gerandine li Amedê doza hatibû vekirin bi dawî bû. Heyeta dadgehê, bi hinceta li ber strana "Oremar" govend girtine her yekî wan 10 meh cezayê girtîgehê dayê. Sumeyye Gok, destnîşan kir ku li Tirkiyeyê êdî govend jî wekî sûc tê dîtin. Cezayê hatiye dayîn ne hiqûqî ye."

## Xwendekarên kurd kirin bersûc

**ÎZMÎR**

Li Zanîngeha Akdenîzê di 16'ê nîsanê de komek nijadperestan êrîşî 2 xwendekarên kurd ên Fakulteya Avasaziyê ya Zanîngeha Egeyê kirin û çek li wan kişandin. Li ser vê yekê komek xwendekarên kurd ji bo protestokirina vê êrîşê li ber fakulteyê çalakiyeke protestoyî li dar xistibûn. Lê li cem polîsan cardin nijadperestan êrîşî xwendekarên kurd kiribû. Ligel ku 2 hefte di ser bûyerê re derbas bûn jî der barê êrîşkaran de tu muamele nehat kirin. Lê li 5 xwendekarên kurd doz hate vekirin. Xwendekarên li Midûriyeta Polîsan îfade dan rastî pirsên, "Hûn endamên kîjan rêxistinê ne?" û "kê ev çalakî bi we da kirin?" hatin. Xwendekar bi şertê serbest bên darizandin sebest berdan. Çalakgeran anî ziman ku di her tiştî de ji bo darizandina xwendekarên kurd û çepgir bahaneyek tê dîtin û wiha pê de çû: "Hemû çalakiyên me yên demokratîk rastî dozan tên. Ji ber ku ev kesên bi çek û êrîşkar tên parastin ewlehiya canê me li zanîngehê nemaye.

www.arsivakurd.org

# 'Çareserî di çekdanînê de nîn e'

Operasyona li hemberî DTP'ê wekî têkbirina hêviyên ji bo çareseriya demokratîk tê nirxandin. Siyasetmedar û rewşenbîr operasyonê wekî hemleya dij-kurd îfade dikin


Eren Keskîn

Endamê Lijneya Rêveber a Komeleya Hiqûqnasên Hemdem (ÇHD) Taylan Tayan, li hemberî operasyona li dijî DTP'ê nerazîbûn nîşan da. Parazvanên mafên mirovan Parêzer Eren Keskîn, Cîgirê Serokê Giştî yê EMEP'ê Kamîl Tekîn Surek û Cîgirê Serokê Giştî yê ODP'ê Alper Taş, anîn ziman ku operasyon û pêkutiyên li dijî DTP'ê derbe li çareseriya demokratîk a ji bo çareseriya pirsgirêka kurd xistiye.

Endamê Lijneya Rêveber a ÇHD'ê Taylan Tayan ku girtina rêveberên DTP'ê yên siyaseta demokratîk dimeşandin wekî "Ne meşrû û derhiqûqî" nirxand, da zanîn pirsgirêka kurd li Tirkiyeyê krîzek çêkiriye û diyar kir ku aktorê nû yê vê krîzê jî hiqûq e. Tayan, destnîşan kir ku operasyon bi destê hiqûqê hatiye pêkanîn û derbirî ku di vê noqteyê de hiqûq ne serbixwe ye. Tayan, da zanîn pirsgirêka kurd ketiye pêvajoyeke nû û bilêv kir ku operasyonên tên meşandin bi guman dişopînin. Tayan ku da zanîn di pirsgirêka kurd de hemû rê hatine ceribandin, daxuyand ku polîtîkayên leşkerî û xizaniyê jî vîna gelê kurd neşikandiye û wiha dom kir: "Ez DTP'iyên hatine girtin baş nas dikim, bi salan e li Tirkiyeyê siyaseta demokratîk dimeşînin. Bi van operasyonan hewl tê dayîn bi hişmendiya dema komarê di roja me de jî bi destê hiqûqê, bi brokrasiya leşkerî, bi tedbîrên ewlekariyê û bûtçeyê pirsgirêkê çareser bikin. Em van operasyonan wekî çavtirsandina muxalefeta kurd a li Tirkiyeyê dibînin. Ji ber vê yekê lazim e hemû rêxistinên kedê yên li Tirkiyeyê li hemberî vê êrîşa li dijî gelê kurd bêdeng nemînin. Gelê kurd bi şiklekî aşkere vîna xwe derxist holê. Muxatabên gelê kurd diyar in. Divê bi wan re bê rûniştin û ev pirsgirêk bê çareserkirin."


Alper Taş


Kamîl Tekîn Surek


Taylan Tayan

### Di polîtîkaya neçariyê de israr dikin

Parazvana mafên mirovan parêzer Eren Keskîn jî, operasyona li hemberî DTP'ê wekî israra hêzên mîlîtarîst a ji bo neçariyê nirxand û wiha got: "AKP û artêş di mijarên wekî pirsgirêka kurd û tevkujiya ermeniyan de li hev kirine û di neçariyê de israr dikin. Ji ber DTP di hilbijartina 29'ê adarê de serkeftî derket hin hêz aciz bûn. Ji ber vê yekê dîsa pêdivî bi rewşa bi pevçûn dîtin. Lê nikarin PKK'ê li derveyî çareseriyê bigirin. Mafê wan tuneye ku ji tu kesê hêvî bikin ji zarokên xwe re, ji bavê xwe re û hevserê xwe re bêjin 'terorîst'. Eger em çareseriyek bê çek bixwazin, divê ev yek ji her du aliyan jî bê xwestin. Tenê bi çekdanîna PKK'ê çareserî nabe. Li vir peywira herî mezin dikeve ser milê dewletê. Ez bawerim çek nabe çareserî, lê bêyî PKK'ê jî çareserî nabe."

### Bêtehamuliya ji bo demokrasiyê

Cîgirê Serokê Giştî yê EMEP'ê Kamîl Tekîn Surek jî, da zanîn ku operasyona li hemberî DTP'ê bêtehamuliya li hemberî encama hilbijartinê ye û diyar kir ku di nêzîkatiya ji bo DTP'ê de polîtîkayeke durû tê meşandin. Surek, wiha got: "Ji aliyekî ve dibêjin 'Ev kar bi çekê çareser nabe. Dest ji çekan berdin bi metodên aştiyane têkoşînê bidin'. Li aliyê din jî li hemberî DTP'ê ku dixwaze li qada siyasî têkoşîneke demokratîk û meşrû bimeşîne polîtîkayeke durû dimeşîne." Surek, bal kişand ku operasyona li hemberî DTP'ê di demek PKK'ê îlan kir dê çalakiyên çekdarî pêk neyne de hatiye destpêkirin.

### Operasyon dibin bingehê pevçûnan

Cîgirê Serokê Giştî yê ODP'ê Alper Taş jî, destnîşan kir ku hilbijartina herêmî di navbera DTP û AKP'ê de wekî referandûmê derbas bûye û anî ziman ku DTP'ê ev referandûm qezenc kiriye. Taş, derbirî ku gel dixwaze pirsgirêk bi riyên aşityane çareser bibe û wiha got: "Dêmekî AKP'ê peyama ku gel di hilbijartinan de da baş fêm nekiriye. Ne dewlet dikare PKK'ê têk bibe û ne jî PKK dikare dewletê têk bibe. Yanî rewşeke wekhev heye. Divê êdî ev pirsgirêk çareser bibe. Ev rewşa neçariyê rê li ber mirina gelek ciwanan vedike. Ev şerekî navxweyî ye û dê encamên vê yekê paşverû bin." **STENBOL / DÎHA**

## Êrîşên li hemberî DTP'ê bi dawî bikin

Partiya Çepgir a Swêdê bi daxuyaniyekê anî ziman ku dawî li êrîşên li hemberî DTP'ê bên anîn.

Parlamenterê Parlamentoya Ewropayê yê Partiya Çepgir a Swêdê (Vänsterpartiet) Jens Holm, Parlamanterê Partiya Çepgir a Swêdê Amineh Kakabaveh û Namzeta PE'yê Bêrîvan Ongorur bi daxuyaniyeke hevpar a çapemeniyê bangî Hikûmeta Swêdê û rêxistinên mafên mirovan kirin ku zorê bidin dewleta tirk ku dawî li êrîşên li hemberî DTP'ê bînin. **STOCKHOLM**

## Şaredarê AKP'î ji hunerê hez nake

Şaredarê Qersê yê AKP'ê Nevzat Bozkuş ku piştî hilbijiartinên herêmî yên 29'ê adarê hate ser kar, 49 karker ji kar derxistin û firina ku ji bo kesên feqîr nanê erzan difrot jî girt. Bozkuş, herî dawî jî tekane Navenda Çanda Qersê girt.

Şaredarê Qersê yê AKP'î Nevzat Bozkuş, berî hilbijartinên herêmî yên 29'ê adarê, gelek soz dabûn gel. Bozkuş ku bi sozên wekî çareserkirina pirsgirêka betaliyê, çêkirina binesaziyê û çareserkirina pirsgirêkên bicihbûnê hatibû ser kar, di yekemîn îcrîata xwe de sozên xwe pûç derxistin. Yekemîn îcrîata Bozkuş bû derxistina 44 karkeran a ji kar. Her wiha midûrên ji kar berpirsiyar jî ji kar derxist û li şûna wan midûrê alîgirê xwe bi cih kir. Bozkuş, Firina Gel a Nan ku ji sala 2002'yan û vir de, nan erzan dida gel jî girt. Bozkuş, herî dawî Navenda Hunerê ya Qersê (KSM) ku girêdayî şaredariyê kar dikir, bi hinceta zirar dike girt.

### 'Keda salan talan kir'

Derhênera Navenda Çanda Qersê Îsrafîl Parlak nerazîbûna xwe anî ziman û diyar kir ku Bozkuş, berî hilbijartinê li ser pêwistiya çandî û hunerî disekinî lê çawa hate ser kar Navenda Hunerê ya Qersê girt. Parlak destnîşan kir ku şaredariyê tenê alîkariya alavan kiriye. Parlak, anî ziman ku şaredariyê ji bilî alîkariya alavan tu alîkarî nedaye wan û tevî van rastiyan jî bi hinceta zirarê çêdike, girt. Parlak, bal kişand ser helwesta Bozkuş û diyar kir ku keda wan ya bi salan bi carekê de ji holê rakiriye. Parlak, derbirî ku li ser bûyerê xwestine bi Şaredarê Qersê yê AKP'î Nevzat Bozkuş re biaxivin lê bi hinceta karê wî pir e wî ew qebûl nekirine. **QERS / DÎHA**







## Ji bo DTP'ê greva birçîbûnê

Saziyên kurdan ên li Îzmîrê bi armanca şermezarkirina operasyona li hemberî DTP'ê û ji bo piştgiriya çalakiya greva birçîbûnê ya bi tevlêbûna 15 hezar kesan li Amedê hate lidarxistin, li NÇM'a Îzmîrê greva birçîbûnê ya ji bo 2 rojan da destpêkirin.

Rêveberên rêxistina DTP'a Îzmîrê û navçeyên wê, nûnerên DOKH, YDG-M, NÇM, Însiyatîfa Dayikên Aştiyê, TAY-DER û MEYA-DER'ê tevî çalakiya greva birçîbûnê bûn. Platforma Em Dikarin Bi Hev re Bi Serkevin a Îzmîrê, SDP, ODP, SEP'ê jî piştgiriyê dide çalakiyê. Serokê DTP'a Îzmîrê Yusuf Kaya ku berî greva birçîbûnê daxuyanî da, anî ziman ku li hemberî pelçiqandin û şikandina vînê ya li dijî partiya wan dê li hemû qadan çalakiyên xwe bidomînin. Seroka SDP'a Îzmîrê Semra Uzunok û Serokê ODP'a Bajêr Îbrahîm Akin jî, anîn ziman ku dê piştgiriyê bidin têkoşîna DTP'ê ya ji bo aştî û demokrasiyê. Piştî axaftinan, nêzî 50 kesan bi sloganên "Pêkutî me bêzar nakin", "Bijî biratiya gelan" dest bi greva birçîbûnê ya heta 2 rojan kirin. Di vê navberê de greva birçîbûnê ya ji hêla 60 PKK'iyên bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser gelê kurd dabû destpêkirin a 2 rojan duh bi dawî bû. DTP'a Mûşê bi armanca şermezarkirina operasyona li dijî partiya xwe dê 2 rojan bikevin greva birçîbûnê. Grev îro dest pê dike. **ÎZMÎR / RIHA / MÛŞ**

## 180 milyon TL deyn di cih de hişt

Ligel îdiaya Şaredarê AKP'ê yê berê Burhan Yenîgun a wekî, "Deynê şaredariyê tune ye" jî derkete holê ku 180 milyon TL (trîlyon) deynê şaredariyê heye. Ligel vî deynî jî derket holê ku Yenîgun 5 salan wesayîta bê ruhsat bi kar aniye. Şaredarê DTP'î Bekîr Kaya diyar kir ku şaredarî di nav 5 salan de hatiye talankirin û gelek kesên bêyî bixebitin meaş digirin hatine tespîtkirin. Kaya anî ziman ku kesên alîgirên AKP'ê yên naxebitin jî ji kar derxistine û dê hesaba hemû diziya hatiye kirin bipirsin.

Şaredar Kaya anî ziman ku gelek kesên 5 salan qet nehatine kar û meaş standine tespît kirine. Kaya diyar kir ku dawî li karê kesên qet nehatine kar anîne û dê hesaba pereyê hatiye dizîn ê waniyan bipirsin. Kaya diyar kir ku ji gelek cihan deyn hatine kirin û ji ber vê yekê heta niha hêj tevahiya deyn nehatiye tespîtkirin. Kaya ev agahî dan: "Ji TEDAŞ, SSK'ê bigire heta Maliyeyê û Defterdariyê ji dehan saziyan re deyndar e. Ligel vê yekê deynê şaredariyê yê ji piyasayê re jî bêhed û hesab e. Gelek deynê Mavî Kent A. Ş. ji derve heye. Ev deyn dema em berhev dikin, dibe du qatê deynê di dema hilbijartinê de me texmîn dikir. Lazim e gelê me deynê şaredariyê bizane. Niha 180 trîlyon deyn heye. Yanî ev deyn her roj zêde dibin. Heta meheke din dê derkeve 200 trîlyonî. Ev deyn ji bo şaredariyê û gel nehatiye bikaranîn."

### 'Mavî-Kent A.Ş kirine cihê talanê'

Li ser mijarê Kaya derbirî ku niha 30 trîlyon deynê Mavî-Kent A. Ş.'yê heye û wiha domand: "Ji bo em vê şîrketê baştir bidin xebitandin, me dest bi xebatan kir. Niha 30 trîlyon teynê wê heye. Ku ev şîrket kar bike, dê şaredarî xebatên baş bike. Lê kirine cihê talanê." Kaya diyar kir ku hemû bîrên avê yên arsenîkî girtine û ji bo çareseriyeke mayînde dest bi xebatan kirine.

Her wiha derkete holê ku Burhan Yenîgun di nav 5 salan de wesayîta wekî ya maqamê bi kar anî li ser Mavî-Kent A. Ş.'yê ye. Kaya têkildarî mijarê diyar kir ku niha 3 wesayîtên şaredariyê yên meqamê jî ji ber deynan hatine hecîzkirin. **WAN**

## Ciwan li pey Denîzan dimeşin

**AMED**

Meclisa Ciwanên Demokratîk û Welatparêz (YDG-M) bi daxuyaniyekê ragihand ku dê girêdayî têkoşîna Denîz Gezmîş, Huseyîn Înan û Yusuf Aslan bimînin. YDG-M'ê bi boneya 6'ê gulanê roja îdamkirina Denîz Gezmîş, Huseyîn Înan û Yusuf Aslan daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de giringiya têkoşîna Denîzan hate destnîşankirin û wiha hate gotin: "Wan ji bo têkoşîna xwe bigihînin serkeftinê tu caran gav paşve neavêtin û tu caran neketin şik û gumanê. Di 31'emîn salvegera dardakirina pêşengên şoreşger de em wan bi bîr tînin û soz didin ku em dê girêdayî doza Denîz, Yusuf û Huseyîn bin." Di daxuyaniyê de bang li hemû ciwanan kirin ku beşdarî têkoşîna biratiya gelên kurd, tirk, laz û ereb bibin.

## Li Geverê Denîz nehate jibîrkirin

**COLEMÊRG**

Li Gevera Colemêrgê ji bo bibîranîna Denîz Gezmîş, Huseyîn Înan û Yusuf Aslan ku di 6'ê gulana sala 1972'yan de hatin bidarvekirin meşek hate lidarxistin. Bi munasebeta salvegera bidarvekirina Denîz Gezmîş, Huseyîn Înan û Yusuf Aslan ku di 6'ê gulana sala 1972'an de pêk hat, li ber Nûnertiya KESK'ê ya Geverê daxuyanî hate dayîn. DTP, KURDÎ DER, aktîvîstên Hemwelatiyên Azad jî piştgirî dan daxuyaniyê. Girseya ku di çalakiyê de dowîzên "Ne qontaxan, em jiyaneke bi rûmet ji bo zarokên xwe dixwazin", "Bijî biratiya gelên kurd û tirk", "Şehîdên gulanê nemir in" rakirin, ji ber nûnertiya KESK'ê heta ber Otela Osla meşiya. Di dema meşê de bênavber sloganên, "Şehîdên gulanê nemir in", "Bila qatil bên darizandin" hatin avêtin. Necat Dogan ku li ber otelê daxuyanî da wiha got: "Tenê bibîranîna Denîzan, Mahîran, Îboyan, Mazlûman û Kemalan ne bes e. Lazim e em ji bo serfiraziya gelên Tirkiyeyê û biratiyê têkoşînê hîn zêdetir bilind bikin." Dogan, bal kişand ser operasyona li hemberî DTP'ê jî û diyar kir ku operasyona hatiye destpêkirin derbeyek li dijî aştiyê ye.

www.arsivakurdi.org



Biyavên deq

Tengezarê Marînî
tengezarmarini_41@hotmail.com

# Kurteçîrok

**Kurteçîrok çi ye?**

Têgeha kurteçîrokê di destpêka sedsala 20'emîn de, ji peyva Îngilîzî "Short stories" peyda bûye. Kurteçîrok formeke toreyê taze yê kurtepexşanê ye. Nîşana sereke ya vî formî, nivîseke himbiz e (TÎR), ku naverokê bi ser hev de tîne. Ev têgeh bi demê re xesletên prosa kurt girtin û li wê gorî xwe biyava xwe fireh kiriye. Forma toreyî ya nêzîkî wê novel (roman) e, lê cudabûna di navbera novel û kurteçîrokê de ew e ku novel ji 30 rûpelên nivîskî derbas dike. Novel ji kurteçîrokê bêhtir nijyarkirî ye ( Structuring).

Kurteçîrok zayendekî ji zayendên toreyê yê herî girîng û zor e. Gelek torezan û rexnegirên toreyê kurteçîrokê ji girîngtirîn zayendê toreyî dideynin û dibêjin, kurteçîrok ji romanê re bû bingeh û li ser hate avakirin. Lewra jî, şêweyê nirixandina romanê ji ya kurteçîrokê ne cuda ye. Ji hêla dîrokî ve, cih û warê kurteçîrokê Yekitiya Welatên Amerîkaye, ku li piştî şerê di navbera başûr û bakur de bû. Ev bawerî, ne hemû nivîskar parvedikin, hinek dibêjin, di dawiya şerê navxweyî (1861-1865) dest pê kir de ye û hin din dibêjin, dawiya şerê cîhana duyem e. Li gorî lêkolînên kurdan yên heyî, dibêjin kurteçîroka kurdî, di destpêka sedsala 20'an de, di kovara Jîn de ye, ku F. Temo yekemîn çîroknivîs e. Li Almaniya jî, destpêka dîroka kurteçîrokê dawiya şerê cîhana duyem e. Hinek mêjûnivîsên toreyê dibêjin, sedema derketina vî zayendî, lezûbeza di nava civakê de peyda bûye, ku jiyana xelkê guherî, nemana metaryalên xam û belengaziya piştî şerê duyemîn û sedema siyan ew e, ku ji bo rojnameyan, nivîs û pexşaneyên kurt pêdivî bûn, lewra kurteçîrok ji bo vê hindê baş bû.

Sê pêşengên çîrokên cîhanî yên bi nav û deng hene, ku hîmên vî zayendê toreyî danîne, ew jî ev in: Mobasan, J. Joyce, A. Tchekov.

**Keresteyên kurteçîrokê:**

Pênasîneke ji sedî sed ji bo têgeha kurteçîrokê bi nîne, ji ber wiha jî, çi keresteyên konkret, ji bo wê tune ne. Lê nayê wê wateyê, ku hindeke xeslet hene. Di toreya vê serdemê de de, ancax nivîskarê kurteçîrok di cihbicihkirinê de, bikaribe wan keresteyan destnîşan bike, yên bi têgeha kurteçîrokê ve têkildar in. Lê du tiştên sereke hene, nabe ku di kurteçîrokê de tune bin, ew jî

1. Girêbestin (Action/Eng. Handlung/Germ.) (ew sedem û girêdanên bûyeran pêk ve, yên bi hev ve girêdayî û di têkilî û dan û standinê de)

2. Pirsgirêk (Konflict), dema du enî li hember hev bin û di demeke ne destnîşankirî de, pêk ve, li deverekê bin, ku pêdiviye nepêk ve bin.

Ev herdû xalên, li jor hatine destnîşankirin, hinekî dîmenê kurteçîrokê diyar dikin, lê nayê wê wateyê, ku ev bi tenê ne, an jî tenê di kurteçîrkê de hene. Ev du kereste di novel, çîrokan de jî hene. Hin xisletên din hene, ku dikarin bibin xislet û xwîner wan di kurteçîrokan de dibîne. Lê ne girîng e, ku di her kurteçîrokekê de serî hildin.

- ✓ Biyaveke kurt
- ✓ Yekrast derbasî hunerê kurteçîrokê bibe, çi buyer, çi cih an jî dem û leheng be, bê pêşgotin, an jî xweşkirina zemînê.
- ✓ Jinişkavebûn
- ✓ Xaleke destnîşkirî, an jî dergehekî vekirî
- ✓ Hebûna girêkan û avakirina pirsgirêkan
- ✓ Kesayetiyek an jî du, fîgurên sereke bin, ku bûyer li ser wan ava bibe û bi dan û stendina wan bi hev re, vebêjî, diyalog an jî dramayeke biçûk peyda bibe. Yek ji wan bêguman wê bibe yê sereke
- ✓ Hinek parçeyên vebêjiyê, jiyana çîrokbêjî vedibêje
- ✓ Vebêjiyeke kronolojîk
- ✓ Metafor û nîşan
- ✓ Zimanekî nêzîkî helbestî himbiz (di pesinê de)
- ✓ Fîgur (Bêhtir mirov)
- ✓ Babetên serdemî yên jiyanê û pirsgirêkên wê
- ✓ Veguhêzbariya cih û demê.

**Çawatiya avakirina kurteçîrokê:**

Kurteçîrok nikare cihekî mezin bigire, lewra pêdivî ye, nivîser li mijara xwe baş hayeder be, ku dema wê, demeke çavmiçûbelkirinê be (flash), biyava demê ji saetan nezêdetir bin û eger xule û saniye bin hîn baştir e, ji ber matmayîn li def xwîner bêtir peyda dibe.

Bikaranîna bûyerê, di demeke kurt de, dihêle xwîner bi balkêşî û matmayîn bixwîne.

Xwîner ji xewê hişyar dike (Kurd dibêjin, serê wî li heda dide) û wî mecbûr dike, ku ta bi dawiya kurteçîrokê bixwîne.

Bo nimûne:

1. Gerîlayekî 15 salî ye, diçe şer". Li vir pirsgirêk derdikeve

Dayik û bavên wî. Zarok û şer. Bindestî û berxwedana bo stendina mafên rewa.

Jiyana zarokê sinêl û jiyan li ser çiyan di nav şer de) û gelek tiştên din jî, dihêlin xwîner berê xwe bide jiyana lehengî, ku wê çi bi serê wî bêt!

2. Malxweyê malê diçe ber dilovaniya xwedê". Pirsên bên kirin, hem dibin konflîk û hem jî action. Jin û zaroyên wî hene? Eger hebe, dê dayik çi bike? Wê kar bike, da ku zarokên xwe yên biçûk rêke dibistanê û abora wan bike? Karê jinê di civakê de? Têkiliyên jinê bi malbata wê û mala xezûrê wê re? Wê zarok bêbav çi bikin? Û gelek pirsên din.

3. Keçek evîndar e, lê evîndarê wî belengaz e û nikare daxwazên wê pêkbîne, şol bi yekî dewlemend dike" Wê çi bi evînarî bêt? Wê keçik di jiyana xwe de, bi yê dewlemend re bi kêf be? Eger mêr pê bizane ku wê hez ji yekî din dikir, dê çi bike? Hevalên wê wê çi jê re bibêjin?

Min ev babetên jiyanê hilbijartin, ji ber dizanim, dê her xwînerek, hinek xalên din di ser ve zêde bikin û hinek pirsên min nivîsîne nepejirînin. Êdî xweşiya xwendinê ev e.

Diyalog, dê ne tenê di hundirê çîrokê de bimîne, belê wê derkeve derveyî wê û pijqên wê li xwîner jî bikeve û ew dê di gel xwe diyalogek nehênî bike.

Hem xwîner bi bûyer, leheng, cih, de û civakê dramê û hem jî hişekî pêkolkirina guhertinê peyda dibe.

Kurteçîrok rê nedit, ku vebêjî dirêj be, an jî bi wateyeke hunerî, hevok ên kurteçîrokê kin, puxt, tîr in. Di kurteçîrokê, rê ji çîrokên di ber nijyara bingehîn re nîne, xwîner bi wan hevokên xwe, derbasî textê rewş û pergalan dike.

Xwegotin û xwevebêjî di kurteçîrokê de, di hundirê diaylog de bi pêş dikeve û danûstendinê pirsan li nik xwîner çêdike.

Vebêjî dikare mîna film dengê diyalog û danûstendinê têkel bike.

Di kurteçîrokan, sere tayî dive bikevîte destê xwîner, bi çi şêweyî be nexem e, çi matmayîn be, jinişkevebûn, ken, girî an jî hungirîn û kêf be.



Prof.Mihê Dîn

# Radîkal, tirsonek in

Gelî ezbeniyan,

Gotineke xweş a pêşiyên me heye: Heke kurmê darê ji darê nebe, zewala darê nabe...

Gelek caran em hemû bi awayekî mafdarane ji xwe pirs dikin: Erê gelo, em xwe li ser cinînkekê (ku ji zeviyê biçûktir e) xwe didin kuştin -ango ev qas çavlimal in- lê dîsa jî bi sedsalan e bindest dijîn. Ev çawa dibe? Yên zirdîn aqilê wan têdiçe û dizanin ku kesê çav li çenînkê be, nikare zeviyê bixwaz e.

Ango, yên ji bo tiştên biçûk xwedî galegal û qerêqêr bin, ji bo tiştên mezin newêrin dengê xwe derbixin. Piştî gotineke din a 'felsefî' ez ê gotinên xwe bi ser esasê mijarê de dawerînim.

Tirsonek, radîkal in.

Hûn ê bêjin, Mihê-Dîn ev gotin ji nav balolika peyvên kê derxistiye?

Mafê we, hûn dikarin pirs bikin. Lê pêşdaraz nebin. Heke yekî beriya min nivîsandibe jî min nexwendiye. Ango, li gorî min ev gotin; 'Med în Mihê-Dîn' e. Gotineke min a orjînal e.

Ev demeke difikirîm ku li ser vê mijarê binivîsim.

Malûm e, her kesê ya di kîsikê xwe de dawerandiye. Gotineke ku li ser TRT6'ê nehatiya gotin ne maye(!).

Piştî weşana vê televîzyonê daye destpêkirin, min tiştek li ser ne nivîsî. Min got; 'bila her kes kîsikê xwe dawerîne, heke tiştek ma ez jî dê bagurdanê xwe li ser bigêrînim...

Lê bi destûra we ez ê hinekê we paşdetir bibim.

Sal 99... ji mehan cotmeh, paş ê jî mijdar û kanûn...

Hin camêran tîrên xwe tûjkiribûn û êrîşî Tevgera Azadiyê dikir. Berê hemû tîran li Rêberê KCK'ê Ocalan bû.

Tişta ku dijmin jî ji bo hevdû nebêjin digotin. Ne tirsonekî û ne jî radestî bûn... tişteke ku nedigot nebû.

Xwediyên gotinê ji 'cenahê malûm' bûn.

Ji bo wan, ji bilî Kurdistana azad û serbixwe çu oxireke din a kurd ji bo şer bikin nebû.

Zêde dirêj nekim.

Hêjayên ji dema DDKD û DDKO'yê heta niha her roj, di nava kîsikê gotinên xwe 5 caran –qewlê Yezdan e- Kurdistan ava dikir, ligel sazkirina TRT6'ê kozik guherand. Ji Kurdistana azad û serbixwe derbasî TRT6'ê bûn. (Hin hêjayên di her şert û mercê de di nêrîna xwe de israr kiriye û niha jî li ser heman baweriyê tevdigerin derî gotinê dihêlim.)

Di navbera 1999-2009'ê de tiştek neguherî ku ev camêr hemû 'xeyalên' xwe bavêjin çemên welat û lingên xwe berdin nav ava Gola Xwê...

Gelek li ser fikirîm.

Niha jî hewl didim ku van kesan fêm bikim. Çima ev qas berevajî gotina xwe tevgeriyan?

Ji bo ku mirov bikaribe vê pirsê bibersivîne divê têgeha 'radîkalîzmê' bê ravekirin.

Li gorî min, radîkal ji tirsonekiya xwe radîkal in.

Ji ber ku nizanin dê çi li cihê ya heyî dahûrînin, dibin radîkal. Lê di encamê de bi erzanî îkna dibin.

Ji bilî dahûrandina 'radîkalîzmê' divê em meseleya cinînkê jî rave bikin. Îro em baş dibînin ku radîkalên 'me' kurmê dara me ne...

Piştî demekê gelê kurd dê pirs bike: Çi ferq di navbera kesên çanda kurdî ji bo TRT'ê dikirin arşîv û kesên lingên xwe berdane nav avexwêya Gola Xwê de heye? Bi rastî min ev nivîs ji bo rojnameya Rojevê amadekiribû lê hûn dizanin çawa qismet hate guhertin û nivîs bû qismetê Hawarê.

HAWARA EYSO

DIZÊN BOSTANÊ KIFŞ DIBIN ZIVISTANÊ




ROJ TV BÛYE BELA SERÊ ERDOGAN




BANDOR A NEYÎNÎ




MÊVANXANEYA ERGENEKONÊ




www.arsivakurd.org

# Ewr: Şano dibistanek e

**Şanoger Metîn Ewr ku weke kesekî paşperdeya şanoyê kurdî tê zanîn, diyar kir ku divê mirov weke dibistaneke hunerê li şanoyê binêre û ji bo perwerdekirina civakê gelekî girîng e**

**I SONGUL ADSIZ** DÎHA / EDENE

Şanoger Metîn Ewr ku heta niha 11 tekstên şanoyê nivîsîne diyar kir ku şano civakê perwerde dike û şanoya kurdî pêşketineke girîng dijî.

Şanoya kurdî ligel ku kokên wê digihêjin dîrokeke kûr jî piştî salên 1990'î pêşketinek berbiçav daniye holê û bi nişfekî nû pêşketina xwe didomîne. Şanogeriya kurdî bi avakirina Navenda Çanda Mezopotamyayê gavên girîng avêt. Gelek şanogerên nû jî derxistin. Ji van kesan yek jî xebatkarê Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Edeneyê Şanoger Metîn Ewr e. Ewr ku demeke dirêj e bi xebatên şanoyê re eleqedar e, heta niha bi navê 'Kevinfiroş', 'Çete', 'Paşom, Fîkrîya', 'Reş', 'Beroşa reş', 'Name' û 'Bîr' gelek şano nivîsandine.

Ewr, bal kişand ser pêşketina şanoya kurdî û bandora li ser wî kirî û wiha axivî: "Malbata min di sala 1994'an de ji navçeya Bismila Amedê ji ber zordariya dewletê koçî Edeneyê bû. Min wê demê dibistan nû xilas kiribû û karek nedikir. Rojekê ji derve hatim malê û ez fikirîm ka çi bikim. Piştî demekê min biryara şanoyê da. Min pênûs û lênûska xwe girt û dest bi nivîsandina şanoyê kir. Bavê min ji min re got 'Tu ji bo çi naçî NÇM'ê naxebitî?' û ez birim NÇM'ê. Ez ji wê demê heta niha li NÇM'ê dixebitim." Ewr diyar kir ku yekemîn lîstika wî ya bi şêwaza trajîkomîk Çete ye. Ewr derbirî ku piraniya şanoyên wî yên din jî bi şêwaza trajîkomîk in û wiha got: "Şanohez jî ji vê şêwazê hez dikin. Ji ber vê yekê bi vî awayî ez zêdetir dinivîsim."

**'Şano civakê perwerde dike'**

Li ser girîngiya şanoyê û bandora şanoyê ya li ser civakê jî Ewr axivî û wiha got: "Ez bawerim di her kesayetiya kurdekî de şanogerî heye. Min dixwest di nav civakê de hinek tiştên paşverû bidim guherandin. Hewce ye carinan hinek astên civakê bên guherandin, tiştê ku ji destên min jî were nivîsandina tekstên şanoyê bû. Şano ne tenê lîstikek e, lazim e mirov wekî dibistanekê li hunera şanoyê binêre. Ji alî perwerdekirina civakê şano herî girîng e."

**'Şanoya kurdî guherî'**

Ewr diyar kir ku şanoya kurdî ji salên 1990'î heta niha gelek guheriye û di nav vê demê de jî qonaxeke mezin bi dest xistiye. Ewr, axaftina xwe wiha dirêj kir: "Şanoya kurdî berê di şahiyan de, di cejnan de ji hêla gundiyan ve dihat lîstin. Şano wekî destanan jî dihat gotin. Rengê şanoya kurdî hate guherîn. Dema berê şanoya kurdî bi kinc û bergên kurdî dihat lîstin. Ji bo pêşxistina civakê di şanoya berê de tiştek tune bû. Di warê nasandina çandê de jî tiştek tune bû. Lê îro di şanoya kurdî de pêşketineke cuda heye. Niha bi her awayî ve wate li naverok û dîtbariya şanoyê tê kirin."



# Li Fransayê berê ciwanan li hunerê ye

**I MURAT AKTAŞ** - ANF PARÎS

Ji salên 1980'î şûn de gelek kurdan koçî Fransayê kir û her wiha li vî welatî di siyaset û çandî de jî ji xwe re cih veqetandin. Ciwanên kurd bi taybetî eleqeyê nîşanê şano û sînemayê didin û lewre jî serkeftina wan balê dikişîne.

Ji van ciwanan yek jî lîstikvan Murat Subaşi ye. Subaşi di Navenda Çanda Kurd a Ahmet Kaya (AKKKM) de xebatên şanoyê dimeşîne û di fîlmê derhêner Phîlîppe Lîoret 'Welcome' de jî rol girtibû. Subaşi li navçeya Elbistana Mereşê di 1987'an de ji dayik bûye û di sala 1990'î de bi malbata xwe re koçî Fransayê kiriye. Subaşi jî wekî gelek ciwanên kurd li Fransayê xwe perwerde kiriye. Subaşi destnîşan kir ku di temenê xwe yê ciwan de eleqe nîşanî şanoyê daye û da zanîn ku gelek ji sînemayê jî hez dike. Subaşi wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di lîseyê de min biryara xwe da ku ez beşa şanoyê bixwînim. Bi vî awayî min li Zanîngeha Nanterre dest bi xwendinê kir. Zêdetir min li ser dîroka sînema û teoriyê perwerdehî didît. Ji ber vê yekê piştî salekê min Nanterre berda û li Cours Florent berdewam kir."



**Malbata min piştgirî da min**

Murat Subaşi ku hê jî li Cours Florent perwerdehiya şanoyê dibîne diyar kir ku ji ber ku dîroka şanoyê 5 hezar sal in şano tercîh kiriye û wiha berdewam kir: "Li gorî şanoyê sînema hêj nû ye. Dîroka sînemayê sed sal in. Li vir em der barê şanoyê de gelek tiştî hîn dikin. Dema ku min biryar da malbata min piştgiriyeke mezin da min. Piştgiriya malbata min ji bo min gelek giring bû." Subaşi beriya fîlmê Welcome di fîlmên wekî 'Le Grand jour' ku derhêner wê Baveganth Jeyakamur e û 'Vodka pomplemousse' ku ew jî derhênerê wî Renaud Lefevber kişandibû de, lîstibû.

**Lîstika 'Du bira'**

Murat Subaşi lîstika bi navê 'du bira' xweser nivîsandiye û derhêneriya wê jî wî kiriye. Subaşi destnîşan kir ku bi piştgiriya Navenda Çanda Kurd a Ahmet Kaya li Parîsê şeva Newrozê derketine ser dikê û lîstik pêşkêş kirine. Lîstik trajediya du birayên kurd ku dema di şer de tên hemberî hev vedibêje. Subaşi da zanîn ku têkoşîna gelê kurd ya siyasî di çandê de baş nayê dîtin û wiha pê de çû: "Gelê kurd bi şer û pevçûnan tê nîşandan. Lê gelek pirsgirêkên girîng ên gelê kurd hene. Gelê kurd di jiyana xwe de gelek êş kişandiye. Ev tiştekî rast e. Her wiha dîrok û çandeke gelê kurd ya dewlemend heye. Daxwaza aştî û aramiyê tenê bi siyasetê nayê îfadekirin, bi hunerê jî tê îfadekirin.

**Ciwan ji hunerê hez dikin**

Subaşi li ser serkeftîbûna ciwanên kurd sekinî û da zanîn ku ciwanên kurd her tim eleqe nîşanî hunerê daye. Subaşi wiha berdewam kir: "Bi taybetî ciwanên ku malbatên wan ji welat koç kirine divê li Ewropayê van derfetan baş bi kar bînin. Derfetên vir gelek baş in. Ez di vê baweriyê de me ku divê em di çand û hunera xwe de israr bikin. Bi tecrûbeyên xwe em difikirin ku kolektîfa şano û sînemayê ava bikin. Me projeyên xwe pêşkêşî nûnerên komeleyan kirin."

## Şevçira



**Omer Dilsoz**

omerdilsoz@yahoo.com

# Ev cinawer kê afirandin?

Bûyer hene; hiş û aqilî mat û metel dihêlin. Tenê mirov bi devê beş lê temaşe dike. Hemû riyên aqilî, tezên ilmî pêpes dibin û însanetî bi 'cinnet û serxweriyeke' nû re hevrû dibe.

Psîko-analîz û sosyolojî nikare 'pênase û teşhîsekê' li qewmînê bike. Zanyar zanîna xwe, zanîna giştî ya gerdûnî dîsa dîsa raçav dike û analîzeke têkûz û beraqlane dernakeve pêş.

Bi yek gotinê, li ber vê bûyera behsê xeberî ziman lal dibe, xwîn di rehekan de dicerise, hiş û hewnê mirovayetiyê xwe li bin guhê lat û zinaran dide.

Ev cinawerên gurgîn ku dikare têjika xwe jî bixwe, ji encama kîjan felekatan berceste dibin?

Wekî hûn jî dizanin, gava gur gelek birçî bibe têjika xwe jî dixwe. Wekî wan gurên li şaroşkeyeka Şemrexa bi ser Mêrdînê 44 têjikên xwe xwarî…

Gelo ev cinawer kê afirandin?

Gelo ev rik û kîna ji bo 'yê ji xwe' ewa li hemberî 'nifş û rengê xwe' ji çi peyda dibe?

Gelo ma nifşek dîtir heye ku ev qas neyarê qewmê xwe ku bêyî ku dudiliyeke biçûk jî pê re çêbe, lûleya tivinga xwe rastî pismam û dotmamên xwe dike û qira wan tîne?

Gelo li ku derê xwîna yê ji mirovî li ber dilê mirovî hinde erzan e?

Kîjan hest û dil vê kiryarê dide kirin?

Kîjan cehalet û nezanî vê bûyerê pesend dike?

Kîjan ehmeqî û serxwerî navekî li vê kiryarê datîne?

Gelo ev cinawer kê afirandin?

Ev cinawerên tî û birçiyê xwîna ji xwe ji kîjan tarîsana dîrokê derketin û hatin bûne kurmê dara Kurdistanê?

Gelo, kê ew çek dane destê wan cinawerên ku bêpaxav bav û bira, dê û xwîşk, pismam û dotmanên xwe li ber guleyan dike bêjîng?

Sosyolog û psîko-analîst dikarin ji vê re bêjin, sendroma kurdan; Sendroma Kurdistanê.

Duh li Darahênê 12 gundî di minûbûsekê de diqelandin, îro li Zankirdê; pêr li Geliyê Zîlan, li Newala Qesaban, an jî berê xwe bidine Helebçeyê belkî eynî cinawer bi ber çavên me bikeve.

Sosyologên resmî digot; Em nikarin navekî li vê bûyerê bikin. Na na, hûn dikarin begino; ji kerema carekê bi çavê ilmî bêalî li vê dilsojiya bindestiya bi sedan salan a Kurdistanê binêrin, hûn ê hingê zelaltir bibînin ka we bi bindestkirin û dewisandinê, bi pişaftin û talankirinê, bi lêdan û hejarhiştinê 'cinawerekî' çawa afirandiye?

Ev cinawer berhema we ye begino; ev cinawerê ku dê û bavê xwe jî dikare bikuje, we bi xwîna 'îxanetê' mijandiye û mezin kiriye. Ev têjik û bîjiyê ji berê we ye; ev encama despotî û zordestiya 'dewlet'a we ye.

Ev cinawer 'bindestiyê' afirandin… Heta ev welat azad nebe ev cinawer jî ji ruhê me dernakevin. Belkî jî me hemûyan ev potansiyel wergirtibe jî. Em bi sendromeke wisa vegirtine, diviya psîko-analîstên şareza demildest teşhîseke nû jê re peyda bikin.

Ev cinawer di mejî û dilê her kurdekî de –mixabin- hêdî hêdî kedî dibe û beden û ruha wî zeft dike.

Werin, em bi hev re vî cinawerî ji nava xwe bikin derê û mirovên vî welatî bi azadiyê rûmetdar bikin. Berî her tiştî 'jiyan'…

# BÎRANÎN



Burhan Bahtiyar -Îsmail)
04.05.2000 Pîran

*Baran çawa tîna axê dişikîne*
*ruh û jiyanê dide dar û beran*
*ew jî bi hebûn û têkoşînê*
*qeyd û bendên*
*hemû bindestiyan dişikîne*
*ruh û jiyaneke azad dide*
*ji ber vê yekê ew di her kêlîka jiyanê de*
*bi ruhekî azad dijîn*

*Em te û şeş hevalên te bi bîr tînin*


**Li ser navê malbata wî xwîşka wî Rehîme û Fîkriye, birayê wî Veysî**

# Konsera dengbêjan û rockê bi hev re

10'ê vê mehê dengbêjên kurd û rockvan li heman sehneyê bi hunera xwe derdikevin pêşberî hunerhezan.

Armanca konserê ew e ku muzîka rojava û muzîka kurd a klasîk bînin ba hev û bi tehmên cihê wan pêşkêşî hunerhezan bikin.

Di konserê de hunermendên kurd Ayfer, Mihemedê Serhedî û Baran dê bi kilamên xwe, rockvanên Amerîkî, Zelandaya Nû, Kanada û Azerbaycanî ku navê koma wan Story Boks e dê bi hunera xwe li ser dikê bin. Her wiha Story Boks di turneya li Tirkiyeyê de dê li Sakarya, Enqere, Bursa û Stenbolê wekî din jî konseran pêşkêş bikin. Konsera Story Boks û ya hunermendê kurd 10'ê vê mehê roja yekşemê saet 19,00'an de li Şanogeha Haldun Dorme a Şaredariya Şîşlî li dar bikeve. *(diyarname.com)*



# Ji şaredariya Norşînê projeyên jinan

## Şaredariya Norşînê ya DTP'ê di destpêkê de ji bo jinan xebat dan destpêkirin û di qatê 3'yemîn yê avahiya xizmetê ya şaredariyê de Yekîneya Şêwirmendî û Piştgiriya Jinê ava kir. Şaredariya Norşînê armanc dike ku jin di her qadê de bêne temsîlkirin

Di bin banê Şaredariya navçeya Norşîn a Bedlîsê de Yekîneya Şêwirmendî û Piştgiriya Jinan hate vekirin. Şaredarê Norşînê M. Emîn Ozkan, diyar kir ku bi vê yekîneyê dê ji bo jinan projeyên di hêla aborî, çandî, civakî de pêş bixin. Ozkan, wiha got: "Ez bawerim bi vê yekîneyê jin dê careke din şarezabûn, yekîtî û piştgiriya xwe derxin holê."

Şaredariya navçeya Norşînê di hilbijartina herêmî ya 29'ê adarê de qezenc kir, piştî xebata çandina şitlan, lez da xebatên xwe. Ozkan ku ji bilî xebatên binesaziyê lez da xizmetên civakî jî, di destpêkê de ji bo jinan xebat dan destpêkirin û di qatê 3'yemîn yê avahiya xizmetê ya şaredariyê de Yekîneya Şêwirmendî û Piştgiriya Jinê ava kir. Bi navenda şêwirmendiyê ya di bin berpirsyariya Nevîn Daşdemîr de hate vekirin, armanc ew e ku jinên navçeyê di civakê de xwe karibin azad îfade bikin, di guherandina civakî de jinan aktîf bikin û vîna wan derxin holê.

**'Dê di guhertinê de aktîftir bibin'**

Berpirsiyara Yekîneya Şêwirmendî û Piştgiriya Jinan Nevîn Daşdemîr Dagkiran jî, wiha got: "Armanca me ew e ku jin bikaribin xwe di civakeke demokratîk de azad îfade bikin, di guhertina civakê de aktîf bibin û vîna xwe derxin holê. Dagkiran, armancên yekîneyê wiha rêz kirin: "Em dê hewl bidin ku jin tevî jiyana çandî, civakî û aborî bibin. Em dê têkildarî pisgirêkên jinan ên aborî nîqaşan bimeşînin, li rê û rêbazên çareseriyê bigerin û piştgiriyê bidin wan. Em dê di mijarên tenduristiya dayik, zarok û hîjyenê de perwerdehiyê bidin û zanistiya jiyana tenduristî pêş bixin. Ji bo karibin pêdiviyên xwe pêk bînin, di hemû cûre çalakî û fealiyetan de bibin alîkar."

**Serkeftina jinan derxin holê**

Şaredar M. Emîn Ozkan, diyar kir ku bi vê yekîneyê re dê hemû cure pirsgirêkên jinan tespît bikin û ji bo çareseriya hemû piştgirêkên psîkolojîk, madî û manewî dê piştgiriyê bidin. Ozkan, da zanîn ku yek ji hedefên yekîneyê jî ew e ku ji bo jinan projeyên di hêla aborî, çandî û civakî de pêş bixe, civakê zana bike ye. Ozkan, destnîşan kir ku dema jin tevî xebat û hilbirînên di nava civakê de bibin wê bi xwe ewlehî û kêfxweşî bi dest bixin. Ozkan, wiha dom kir: "Bi vê yekîneyê dê piştgirî, yekîtî û serkeftina jinan careke din derkeve holê. Ji bo jinên Norşînê tevî aboriyê û hilbarînê bibin em dê hewl bidin derfetan biafirînin. Bi jinên hilberîner re ji bo navçeya me çi pêwîst be em dê pêk bînin. Armanca me ew e ku jin bikaribin xwe di nava civakeke nûdem û demokratîk de bikaribin azad îfade bikin û civakê pêşve bibin. Ji bo jin bi xwe ewleh bibin, li ser lingê xwe bikaribin bisekinin, bi her cure pirsgirêkan re karibin eleqedar bibin û di qadên tenduristî û perwerdehî de xwe bibînin me Yekîneya Piştgiriya Jinan saz kir." **BEDLÎS / DÎHA**



Nevin Daşdemîr



### Şaredariya Mûşê piştgirî da astengdaran

Şaredariya Gimgimê bi armanca piştgiriyê sendeliyeyên tekerî li astengdaran belav kirin.

Şaredariya Gimgimê bi piştgiriya Komeleya Frankfortê ya Gimgimiyan 11 sendeliyeyên bi tekerî yên hatine şandin li hemwelatiyên astengdar belav kirin. Şaredara Gimgimê Gulşen Deger, diyar kir ku bi belavkirina sendeliyeyên bi teker pirsgirêkên welatiyên astengdar bi dawî nabin û wiha domand: "Ji bo di nav jiyanê de baştir cih bigirin çi ji destê me bê em ê bikin. Me dixwest derfetên me hebûna ku di zûtirîn demê de me hemû pirsgirêk çareser bikirina lê ev yek jî gava yekemîn e." **MÛŞ**

## Li Tirkiyeyê xwendin û nivîsandina jinan kêm e

Li Tirkiyeyê ji 5 jinan jinek xwendin û nivîsandina wê nîn e. Ji sedî 40'ê jinan li ser daxwaza malbatan, sedî 20 jî bêyî mehra fermî têne zewicandin. Ji sedî 42 jin bi şîdeta fîzîkî û cinsî re rû bi rû dimînin. Her wiha ji 3 jinan jinek rastî şîdeta hevserê xwe tê. Ji sedî 65 jin dernakevin hemberî mêvanên xwe. Salê 2 hezar 500 jin ji bo zarok bînin dinê jiyana xwe ji dest didin.

Komîteya Peyama Li Dijî Cudabûna her Cureyî ya Li Hemberî Jinê ya Neteweyên Yekbûyî (CEDAW), li gorî daneyên Midûriyeta Giştî ya Statuya Jinan raporek amade kir. Rapor li ser rewşa jinên Tirkiyeyê hate amadekirin. Di raporê de tişta herî balkêş û derketî ber çav hejmara xwendin û nivîsandina jinan e. Li gorî raporê ji sedî 75 jin xwendin û nivîsandina wan nîn e.

Di rapora CEDAW'ê de hate aşkerakirin ku li Tirkiyeyê rewşa jinan nebaş e û bi pirsgirêkên dijwar re rû bi rû dimînin. Pirsgirêkên jinan wiha hatin rêzkirin. Ji 5 ducaniyan ducaniyek alîkariya tenduristiyê nagire, li çolteran ji sedî 47, li bajaran jî ji sedî 20 ducanî pêşiya welidînê naçin doktoran. Ji 6 ducaniyan ducaniyek bê alîkariya tibbi zarokê xwe tîne dinê.

Her wiha di raporê de hate destnîşankirin ku ji 100 jinan 13 jin ji bo xwe dişixulin. Ji sedî 64 jin bê ewlehiya civakî dixebitin. Ji sedî 24 jin di rêxistinên sivîl de kar dikin, ji sedî 13 jin di partiyên siyasî de dixebitin û ji sedî 5 jin jî di sendîkayan de cih digirin. Ev rapor rastiya rewşa jinên Tirkiyeyê nîşan dide. **ENQERE**

## Civîna Meclîsa Jinan a DTP'ê pêk hat

Meclîsa Jinan a DTP'ê ji bo nirxandina rewşa rêxistinî û operasyonên li hemberî DTP'ê civînek li dar xist.

Civîna Meclîsa Jinan li Navenda Giştî ya DTP'ê pêk hat. Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna, parlamenter û endamên Meclîsa Partiyê tevli civînê bûn. Endama Meclîsa Jinan Fatma Kaşan axaftinek kir û bal kişand ser civînê. Kaşan, diyar kir ku piştî hilbijartinên herêmî meclîsa jinan civîna xwe ya yekem li dar xist, piştî civînê li hemberî partiya wan operasyoneke berfireh pêk hatiye.

Kaşan, destnîşan kir pirsgirêk bi riya demokrasiyê tê çareserkirin û wiha axaftina xwe dom kir: "Di civînê de dê zextên li ser DTP'ê bên nirxandin. Piştî hilbijartinên herêmî dewlet helwesta xwe ya li hemberî pirsgirêka kurd bi înkar û îmhayê careke din nîşan da. Bûyerên ku li Amarayê qewimîn û operasyonên li hemberî DTP'ê mînakên herî girîng in. Bi girtin û binçavkirinê daxwaz dikin xebatên DTP'ê asteng bikin û ji holê rakin. Her wiha pêvajoyê sabote bikin."



**Pergalê îflas kir**

Kaşan bal kişand ser kuştina endamê Rêxistina Biryargeha Şoreşger Orhan Yilmazkaya û got ku heke bihata xwestin dê Yilmazkaya zindî bihata girtin, lê Yilmazkaya hate înfazkirin. Kaşan di axaftina xwe de li ser bûyera Mêrdînê sekinî. Kaşan, daxuyand ku cerdevanan bi tevahî 44 kes kuştin û wiha got: "Bûyera ku li Mêrdînê pêk hatî divê ji pêvajoyê cuda neyê nirxandin. Bûyereke tarî ye. Hîn herêm ji sivîlan re hatiye qedexekirin. Ev konsept wekî konsepta sala 1993'an e. Ev bûyer nîşana îflaskirina pergala cerdevaniyê ye. Dewlet li dijî çareseriya pirsgirêka kurd çek da destê gel û ev trajedî çêbû." Kaşan, da zanîn ku divê li ser vê bûyerê bisekinin û ev bûyer ne bi navê toreyê hatiye kirin. Kaşan, destnîşan kir ku divê dewlet dest ji van polîtîkayên xwe yên bi vî rengî berde û nêzîkatiya dewletê ya ji bo pirsgirêka kurd di vê bûyerê de derket holê. Piştî axaftina Kaşan civîn ji çapemeniyê re girtî dom kir. **ENQERE / DÎHA**

## Pêşangeha berxwedêrên DESA'yê












Di çarçoveya Mîhrîcana Fîlmên Karkerên Navneteweyî de pêşangeha berxwedêrên jin ên DESA'yê hate vekirin. Pêşangeh bi navê 'Karkerên jin li DESA'yê li ber xwe didin' hate vekirin. Pêşangeh li Navenda Çanda Kazim Koyuncuyê hate vekirin. Dê wêneyên wênekêş Bahar Çelîk, Fîlîz Karakuş, Gulşîn Ketencî, Nîlgun Yurdalan, Serra Akcan û Ozge Ozguner hatin pêşkêşkirin. Her wiha wêneyên berxwedêr Emîne Arslan, Gulhaz Akyuz, Dîlek Akyuz, Atîke Akçay, Nuray Ozdîlek, Esra Karabulut û Canan Çelîk jî bi kurtejiyana wan re di pêşangehê de cih girt. **STENBOL**

## 2 jinan agir berda bedena xwe

Jineke 41 salî û jineke 75 salî li başûrê Kurdistanê agir berda bedena xwe û dawî li jiyana xwe anîn.

Li nahiyeya Qerehencîrê ya Çemçemalê jineke 41 salî li ber çavê xelkê nahiyeyê 5 lître benzîn bi xwe de kir û agir berda bedena xwe. Di vê mijarê de rêvebirên polîsê nahiyeya Qerehencîrê Osman Ebdulla diyar kir ku piştî ku binkeya polîs ji bûyerê hate agahdarkirin, gihîştine cihê bûyerê, me dît agir ji laşê jinekê bilind dibe. Piştî tefandina agir, jinik ji binkeya tenduristiyê ya nahiyeyê re hate şandin.

Li gorî agahiyên ku hatin bidestxistin xwediya 5 zarokan e û gotiye, di navbera wê û hevserê wê de pirsgirêkek qewimiye û ji malê reviyaye, li qezaya Çemçemalê 5 lître benzîn kiriye û li Qerehencîrê li ber çavê xelkê benzîn bi xwe de kiriye û dawî li jiyana xwe aniye.

Rayedarên polîsên Qerehencîrê anî ziman ku li gorî rapora doktoran ji sedî 100 laşê wê şewitiye û ji ber ku rêjeya şewatê zêde ye ji nexweşxaneya Silêmaniyê re hatiye şandin.


Her wiha li qezaya Daquqê jineka 75 salî ji zilma ku kurên wê li wê dikirin, xwe şewitand û jiyana xwe ji dest da. Li gorî agahiyên ku cîranan jina 75 salî neft bi xwe de kiriye û xwe şewitandiye.


Cîranan diyar kir ku ew dayika 75 salî bi eslê xwe tirkmen e û ji aliyê kurên wê ve zilmeke zêde li wê dihate kirin. **KERKÛK**

www.arsivakurd.org

## Şîr vexwin

Pisporan diyar kir ku rojê nîv lîtra şîr ji bo tenduristiya mirovan pir baş e û divê bê vexwarin. Bi taybetî ji şîr çermê mirovan nerm dike. Asîtên rûn ên di nava şîr de çermê rûyê mirovan nerm dike û çermê mirov zindî dihêle. Her wiha pisporan got ku heke kesên ji şîr hez nakin an jî nikarin vexwin li şûna şîr dikarin mast, penêr û dew jî bixwin. Ev jî qasî şîr baş e û cihê şîr dikarin bigirin. Pispor dibêjin ku şîr an jî xwarin û vexwarinên ku ji şîr têne çêkirin ji bo her kesî baş e. Madeyên di nava şîr de bandoreke baş li ser çermê mirovan dike. Hem çermê mirovan nerm dike û hem jî nahêle bakterî zêde bibin. Her wiha şîr bandorên kal û pîrbûnê jî derengî dixe. Ji ber vê yekê jî rojê nîv lître bê vexwarina şîr baş e. **AMED**





Dêra dîrokî ya li gundê Qesrika Payîzavayê ji ber xemsariya rayedaran bi qedera xwe re rû bi rû hatiye hiştin. Heta niha ji ber ku ji bo parastina dêrê tu tişt nehatiye kirin dîrokek winda dibe

# Dêra dîrokî winda dibe!

Dêra Hogecvank (Dêr Meryem) a ku dêra herî mezin a Kurdistanê tê zanîn û li gorî agahiyan di sedsala 9'emîn de hatiye çêkirin bi hilweşînê re rû bi rû maye. Dêra dîrokî ji ber xemsariyê her diçe hildiweşe. Dêra ku weke cihê ku Îsa lê dayik bûye tê qebûlkirin û ji 666 odeyan pêk tê niha bûye cihê sewalan.

Dêr Meryem a li gundê Qesrika navçeya Payîzavaya Wanê ku di sedsala 9'emîn de hatiye çêkirin weke stargeha sewalan tê bikaranîn. Dêra dîrokî 31 kîlometre dûrî navenda navçeya Payîzavayê ye. Li bakurrojhilatê çiyayê Kûşê hatiye çêkirin û piştî 1'emîn Şerê Cîhanê jî hatiye terikandin. Dora dêrê bi dîwaran hatiye girtin û 666 odeyên dêrê hene. Tê gotin ku dêr demekê weke xane hatiye bikaranîn. Lê niha weke stargeha sewalan tê bikaranîn. Xizînegeran her tim li dêrê li zêran geriyane û weke ziyaret jî tê dîtin.



**Cihê ku Îsa lê ji dayik bûye**

Dêra dîrokî weke cihê ku Îsa lê ji dayik bûye tê qebûlkirin. Di serî de jinên ku zarokên wan çênabe dêr ziyaret dikirin û gelek kes dihatin vê derê.

Ji gundê Qesrikê welatiyê bi navê Kiyasettîn Ozcan tiştên ku der barê dêrê de ji kalê xwe bihîstine wiha vedibêje: "Ev dêra ku weke cihê ku Hz. Meryem tê de maye tê zanîn li gorî tiştên ku kalê min digot ji aliyê ermeniyan ve hatiye bikaranîn. Ji ber ku weke cihekî pîroz dihat zanîn li her aliyê cîhanê gelek kes ji bo ger û îbadetê hatine vê derê. 50 jinên ku li dêrê diman li qiraxa çem kuçik dadidan û li vir xwarin çêdikirin û ev xwarin didan her kesî. Kesên ku dihatin vê dêrê mal û canê xwe teslîmî dêrê dikirin û şeva xwe li vir derbas dikirin. Di dema komkujiya ermeniyan de kesên ku li dêrê dijîn bi zorê tên sirgûnkirin. Kesên ku dimînin jî tênе kuştin û dêr tê talankirin. Notirvanê ku 7 salan li ber derê dêrê nobedariyê dike jî bi deriyê dêrê ve tê girêdan û wî davêjin çem."

**Hz. Meryem li vir jiyaye**

Li gorî baweriya şêniyên herêmê Hz. Meryem li vir jiyaye û Îsa jî li vir ji dayik bûye. Ji ber vê yekê jî şêniyên herêmê 2 saet dimeşiyan û dihatin Dêr Meryemê. Li vir îbadeta xwe dikirin. Bi taybetî jî cotkarên ku dêrê weke cihê ku Îsa lê ji dayik bûye qebûl dikirin dihatin vir û dua dikirin. Dîkên ku dianîn vê derê serjê dikirin û serê dîk davêtin nava dêrê û dua dikirin. Serê dîk biketa ber kê wê demê li benda qebûlkirina daxwaz û duayên xwe diman.

**Hatiye jibîrkirin**

Dêra dîrokî heta niha nehatiye parastin û ji bo parastinê jî tiştek nehatiye kirin. Dêra dîrokî bi qedera xwe re hatiye hiştin. Leşkerên ku derdikevin operasyonan li ser dîwarên dêrê sloganan dinivîsînin. Ji bo lêkolînê rayedaran qet berê xwe nedane dêrê. **WAN / DÎHA**

## Keçelhenek derketin

Li navçeya Bîrecîka Rihayê keçelhenekên salê ji hêkan derketin. Hejmara keçelhenekan par 91 heb bû. Keçelheneka nû ya îsal beriya demekê ji hêkê derket. Di encama lêkolîn û kontrola Komeleya Xwezayê heta niha 15 keçelhenekên nû hatine tespîtkirin. Rayedarên Komeleya Xwezayê diyar kirin ku bi derketina keçelhenekên nû dê hejmara wan zêde bibe. Ev keçelhenekên nû kêm be jî dê bandorê li ser nifşên keçelhenekan bikin. Ji ber ku her diçe nifşê keçelhenekan tune dibe.



Keçelhenekên navçeya Bîrecîkê zivistanê di qefesan de dimînin. Di navbera mehên adar û tîrmehê de jî li derdora çemê Firatê dijîn. Keçelhenekên ku hejmara wan kêm dibû ev çend sal in ji aliyê rayedaran ve tên parastin û ji bo zêdebûna nifşên wan tedbîr tênе girtin. Ev tedbîrên ku hatine girtin encamên erênî jî didin. Bi taybetî jî Komeleya Xwezayê ji bo parastina nifşên keçelhenekan li Bîrecîkê xebatên xwe didomîne. **RIHA**

## Kîsoyê Firatê tune dibin

Nifşê kîsoyê wekî Kîsoyê Firatê tê zanîn û tenê li rûbarên Dîcle û Firatê dijî ji ber bendavan bi tunebûnê re rû bi rû ye.

Ji ber bendavên li herêmê tên çêkirin, gelek zindewarên tenê li herêmê dijîn ber bi tunebûnê ve diçin. Ji ber ku bendav bêyî xebateke ekolojîk bê kirin û tedbîr bên girtin tên çêkirin, zindewarên li herêmê bandoreke neyînî dibînin. Ji van zindewaran yek jî kosiyên bi navê Kîsoyê Firatê ye. Kîsoyê Firatê li cîhanê tenê di rûbarên Firat û Dîcleyê de dijî. Berpirsyarê Komeleya Xwezayê ya Herêma Rihayê Çetîn Turan têkildarî mijarê agahî dan û daxuyand ku ji ber xemsariya dewletê gelek zindewar tune dibin. Turan derbirî ku ji ber bendavên li Şirnex, Êlih û Rihayê tên çêkirin, Kîsoyê Firatê ber bi tunebûnê ve diçe. Turan got ku kosî êdî tenê dikarin li deverên bendavan ên kêmav bijîn û ji ber vê yekê di salên dawî de hejmara wan hindî diçe kêm dibe. Turan wiha axivî: "Hejmara bendavan hindî diçe zêde dibe. Lê berî çêkirina bendavan tu xebatên ekolojîk nayên kirin. Ji ber vê yekê gelek zindewar tune dibin. Ligel Kîsoyê Firatê gelek kosiyên din jî tune dibin. Kîsoyê Firatê li cîhanê gelek girîng e, ji ber ku tenê di Dîcle û Firatê de dijî. Bendav tenê ji bo hind armancan tên çêkirin. Lê lazim e tişta herî girîng zindewarên li van qadan dijîn bin."

Turan da zanîn ku piştî çêkirina bendavan av kêm dibe û germahiya avê diguhere û ev tişt gotin: "Ji ber vê şert û mercên jiyana van serobino dibin. Me li ser mijarê li Heskîf û navçeyên Hewag û Birecûkê yên Rihayê lêkolîn kir. Li Hewag û Bîrecûkê tenê li derdora 20 kîsoyan mane. Berê bi hezaran kosî hebûn li vir. Niha hejmar pir kêm bûye. Niha em nifşê wan dişopînin lê ji bo parastinê dewlet tiştekî nake. Lazim e di dema çêkirina bendavan de ekolojî li ber çavan bê girtin." Turan daxuyand ku di rapora bi navê 'Ilısu Wasserkraftwerk' a ji hêla 15 welatên piştgiriyê didin Bendava Ilisûyê ve Tirkiye ji ber Kîsoyê Firatê hatiye hişyarkirin û zindewarên din jî hatine bibîrxistin. Turan got ku heta niha tu tedbîr nehatine girtin û xwest ku hem raya giştî hiştiyar be û hem jî dewlet tedbîran bigire. **ŞIRNEX**

## Sewal bi şev çawa dibînin?

Zanyarên alman li ser sewalan lêkolînek kir. Di lêkolînê de xwest fêm bikin ku sewal bi şev çawa dibînin. Derket holê ku sewalên ku bi taybetî bi şev nêçîrê dikin bi saqa hucreyeke DNA'yê dikin. Ev hucreya DNA'yê dihêle ku sewal bi şev baş bibînin. Lêkolîn ji aliyê zanyarên Zanîngeha Ludwig-Maximilans a Munihê ve hate kirin. Zanyaran diyar kir ku hucreyên bi navê fotoreseptorê di çavên wan de dibe weke mercekan û bi vî rengî ronahiyê dide çavên wan. Hate ragihandin ku ev lêkolîn di kovareke zanistî de jî hate weşandin. **BONN**